
Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1383 7-Pûşper-2026 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ rojnameyaronahi @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com Rojnameya Ronahî +963 984 370 218

# ‘Piştî azadbûnê em bi hêztir bûne’

Dilîn Ehmed/Qamişlo



**Şervanê bi navê Alan Hesen ku tevî bi sedan ji hevalên xwe ji aliyê hikumeta demkî ya Sûriyê ve hatibû dîlgirtin diyar kir ku ew ê rêya berxwedanê dewam bikin û wiha got: “Divê her kes bizanibe ku tu tişt nikare me bê hêvî bike, piştî ku em azad bûn, em bi hêztir bûn û me soza xwe ya domandina têkoşînê bi şehîdên xwe re nû kir.”**

Di welatê ku alozî û şer lê heye her tim armanca dijmin têkbirina destkeftiyan e. Lewra ew şerê teybet mîna şerê çekdarî dide meşandin. Ji bo ku destkeftiyên Şoreşa Rojava ya keda 15’e salan têk neçe, di navbera Hêza Sûriya Demokratîk (QSD) û hikumeta demkî ya Sûriyê 29’ê Çileyê peymanek hat çmzekirin. Li gorî peymanê wê xebatên entegrasyonê bên meşandin û di mijarên leşkerî, siyasî-îdarî, jin, aborî, perwerde û koçberiyê de gav werin avêtin.

Bi erêkirina her du aliyan li gorî peymanê Hêza Sûriya Demokratîk (QSD) bê şerê çekdarî ji bajarê Reqa, Tepqa û Dêrazorê derkevin, lê hin eşîreyên Ereban, hikumeta demkî ya Sûriyeyê û komên çete yên girêdayî dewleta tirk bi lîstokên xwe yê xapandinê, beriya seatên ku li ser hatibû li hevkirin, êrîşî şervanan û sivîlên wê derê kirin bi taybetî gelê Kurd. Di encamê de bi sedan şervanên Kurd û Ereb ji aliyê hikûmeta demkî ya Sûriyê ve hatin dîlgirtin. Di nav wan de ciwanê kurd yê bi navê Alan Ebdulhadî Hesen yê 27 salî, di 17’ê Çileya 2026`an dîlhatibûn girtin û di 23`ê Gulanê de azad bû.

**‘Gotinên wan berovajî rastiyê bû’**

Ji dîroka girtinê heta ya azadiyê Alan Ebdulhadî Hesen wiha behsa çîroka xwe dike: “Em bi soz û gotinên wan yê berovajî rastiyê hatin dîlgirtin. Agahî ji me re hat ku em hêza xwe ji Dêr Hafirê bikşînin, me jî li gorî lihevkirina di navbera me û wan de, hêza xwe kom kir da ku em ji Dêr Hafirê derkevin. Em gihiştin bajarê Meskena, destpêkê du gurûpên hêzên me derketin, li ser xala kuntrolê ya ewlehiyê ya bajarê Tebqayê hatibûn dîlgirtin lê ji ber qutkirina têkilya di navbera me de, me ev yek nizanî bû. Piştî wê bi kêliyan hinek komên Hemzat û Emşata em dîtin ji me re gotin lihevkirin çêbûye tenê hinek agahî û pirs hene emê ji weke bikin. Berê me dan Helebê, li wê derê me hevalên xwe yê ku beriya me derketibûn hatibûn dîlgirtin, wê demê me naskir ku em ji hetin dîlgirtin. Tişta ku ez pir bê êşiyam ewe bû ku, gelê me wan ji mirinê rizgar kir û hevalên ku me bi hev re şerê DAIŞ`ê kir, me dana dîlgirtin.”

Piştî girtina Alan û hevalên wî li zindana Helebê ku li gorî Alan destnîşan dike ku di her odeyeke zindanê jimara girtiya digihişt 140 kesî. Alan diyar dike ku piştî soza wan ya ji rizgarkirina dûr bû, rojbiroj denûstandina wan û gotinên wan bi girtiyan re dihat guhertin. Alan Hesen wiha dibêje: “Piştî 15`e rojên min li zindana Helebê ez birim zindana Îdlibê, li wê derê min xistin zindana bitenê. Beriya ku ez hevalên xwe li zindanê bibînim, min nizanî ku hejmara dîlgirtina gihiştiye vê hejmarê, ne jî hejmara şehîdan.”

Ji ber vê yekê kêliya ku Alan azad bû gotina destpêkê got (Em deyndarê şehîdên xwe ne) herwiha cihê yekê ku Alan ziyareta wê kir, şehîdligê bû û bi hisrê xwe lêbûrîna xwe ji şehîdan xwest.

**‘Berxwedan jiyan e’**

Bûyera her zêde ku di zindanê de bi Alan re derbasbûye û nayê ji bîrkirin ewe ku, dema bi ciwankî Kurd re ku ji bajarê Efrînê bi kurdî diaxive Alan wiha behsa wê bûyerê dike; “Min rûyê wî ciwanê Kurd jî ne dîtibû tenê min dizanî bû ku ew Kurd e. Ew jî ewke min di odeya bi tenê de bû. Ji bo em moral bidine hev min jê re got (Berxwedan Jiyane) di wê kêliyê de kesê ku li ber deriyê me dima dengê min kir û me her duyan îşkence kirin.”

Alan diyar kir ku weke ku şerê li ser gel dihat meşandin, li ser dîlgirtiyan jî bi rêbazekî hîn dijwartir dihat bikar anîn. Alan bibîr xist ku di zindanê de herî zêde dixwestin ku moralê dîlgirtiyan bişkînin bi gotinên mîna QSD nema Hesekê û Qamişlo jî ketiya bin kontrola hikumeta demkî ya Sûriyê, diaxivîn. Alan li ser gotinên wan axaftina wiha berdewam kir: “Jixwe armanca wan ya sereke ji dîlgirtina ev yek bû ku bi gotinên xwe yê ji rastiyê dûr, moralê me bişkînin û wan ji doza wan dûr bikin. Lê her kes vê yekê baş bizane ku wê ti tişt nikaribe me bê hêvî bike. Heta mirinê emê li ser vê fikir û felsefeyê bijîn, piştî ku em azad bûn em bi hêztir bûn û me soza xwe bi şehîdên xwe nû kir.”

Alan Ebdulhadî Hesen di dawiya axaftina xwe de bang li tevahiya gelê azadîxwaz kir ku ji bo dîlgirtinan tevlî çalakiyên xwepêşandana ji bo dîlgirtiyan dakevin kolanan.

Gotina Dawî



Mihemed Seydi

## Gelo wê lêvegera Kurdan ava bibe!

Ev serê çend salan e ku her tê gotin ger Rojava şîv be, ew ê Başûr jî paşşîv be. Di vê derbarê de hişyarî hatin dayîn û bi taybet di dema êrişin DAIŞ li ser Hewlêrê de di sala 2014’an zêdetir xeterî hat ber derî. Ji bo Kurd nebin berxê ber kêrê, ciwanên Kurd xwe kirin mertal û di sengerên şer de pêşî li vê xeteriyê girtin. Di dema şerê di van sengeran de jî bang dihat kirin ku rayedarên Kurd û serokên Partiyan li hev bicivin û mecliseke ku derbarê çarenivîsa Kurdan de biryarê bidin ava bikin. Hin hewldan di salên 2013’an de hatin dayîn û alî li hev civiyan, lê paşê ji ber sedemên ku heta niha jî nehatine eşkerekirin, hemû ji hev belawela bûn. Hewlêrê ji aliyekî, Silêmaniyê aliyê din û Qamişlo û Amed jî li aliyekî. Ji wê demê ve û heta dema me ya niha, hîne jî li nava bajaran, kolanan û malan, Kurd hêvî dikin da ji bo wan jî mecliseke aqilmendan a hevgirtî hebe da hemû him barê Kurdan rakin û him jî bibin lêvegera siyaset û jiyana Kurdan li hemû deverê. Ji ber ev yek pêk nehat û hemû aliyên siyasî pir teng li mesela Kurd dinêrin, Efrîn ji aliyê Turkiyê ve hat dagirkirin û hin aliyên Kurd pesna vê dan û ji wan be ger PYD li cihekî wenda bike, ew ê ji bo wan qezenc be. Li Kerkukê heman tişt û heta Serê Kaniyê û Şêxmeqsud. Tevî van hemû bûyerên ji bo Kurdan bi êş, hîne jî hin alî di bin navê ku siyaset dikin, dixwazin hevdû zeif bikin û derban li hev bixin. Di hefteya derbasbûyî de, ji rêveberên PYD’ê Aldar Xelîl di bernameyeke Platforma EL-Mubaşer de, eşkere kir ku Hewlêrê di pişt wan re çûye ji bo ENKS’ê bi Şamê re civîn organîze kirine da lihevkirin bi dizî çêbibin. Heta nivîsandina vê gotarê jî Hewlêrê li ser van tohmetan bersiv nedaye, lê ger rast be, gelo çiqas di cih de ye ku di pişt hev re ji bo berjiwendiyên teng, çarenivîsa miletekî bixin bin erdê?

Li aliyê din, di pîrozbahiya salvegera avakirina YNK’ê de li Silêmaniyê serokê partiyê Bafil Talabanî axivî û çend gotinên dilê Kurdan xweş dike kirin. Talabanî bang kir ku ew li pêyî wê ne da lêvegereke giştî ji bo Kurdan çêbikin ku hemû alî di nav de hebin û êdî çarenivîsa Kurdan li Kurdistanê û li Ewrûpa nebe bêxwedî. Ev helwest li aliyekî dilê mirovan xweşbîn dikin lê bûyerên diqewimin, tirsê dixin nava Kurdan. Îro serokê Amerîka Donald Trump careke din Tomas Barack kir nûnerê xwe yê Sûriyê û Îraqê. Ev kes jî bi siyaseta xwe ya divê xweseriya miletan di nava van welatan de nemîne, tê naskirin û vê yekê eşkere dibêje. Lewma îro tişta ku li Rojavayê Kurdistanê pêk hat, dixwazin Başûrê Kurdistanê jî heman tiştî pêk bînin. Yanî, hişyariyên ku bi salan ji bo başûr dihatin kirin, îro ew pê re rûbirûye. Birêz Ocalan lewma bang li birêz Mesud Berzanî kir ku bi lez kongreya Netewî pêk bînin û ew bila xwe wekî serokê wê diyar bike, da Kurd li ber lehiyê neçin. Lê heta niha ne tu kongre û ne jî tu Lêvegereke bi niyeta Kurdparêziyê li holê heye. Ger ev alî erka xwe bi cih neyînein, destê xwe nexin bin bar û erkên ku bi wê bang dikin pêk neyînin, tu xweseriya Kurdan li holê namîne.

## FERHENGA BIWÊJAN

**LI SER SARBÛNA JI KAREKÎ**

**Destê min lê nagere:**
- Ji dilê min nayê; xwestek bi min re nîne.

**Destê min nagire:**
- Bi heman wateyê.

**Destê min jê sar bûye:**
- Bi heman wateyê.

**LI SER SOZDAYÎNÊ**

**Bigotin e:**
Li soza xwe xwedî derdikeve; ji soza xwe dernakeve.

**Destê min di dohnê helandî de be:**
- Çiqas karê min yê bilez û girîng hebe jî.
(Dema yek dixwaze sozeke bawerîyê bide vê gotinê dibêje)

**Destê min di xwînê de be:**
- Bi heman wateyê.

**Destê min di nava hevîr de be:**
- Bi heman wateyê.

**Destê min di hingiv de be:**
- Bi heman wateyê.

**Ez deynê dêran jî bikim:**
- Çi dibe bila bibe; ku ez biçim xwe rezil bikim, xwe muhtacê dêran jî bikim.

**Ez li ser gotina xwe me:**
- Ez poşman nabim; ez gavê bi şûn ve navêjim; ez li ser soza xwe me

**Ez li ser soza xwe me:**
- Ez li ser gotina xwe me; ez ne poşman im.

**Ez nizanim ava reş bi çavê min de were:**
- Ez xwediyê soza xwe me; korbûn ne tê de, weke din çi dibe bila bibe ezê soza xwe pêk bînim.

**Gepek li ber xist:**
- Soz dayê **ku** tiştekî bidiyê.

**Hesp bi hevsaran, mêr bi qiraran:**
- Hesp bi hevsaran tên girêdan, mirov bi sozan.

**Ji vî çavî ber bi vî çavî:**
- Çavê min jî tê de biçe ezê soza xwe pêk bînim.

**Ma li ser zeyta xwe:**
- Xwe neguhert; xwe xirab nekir; li ser soza xwe ma.

**Ma ti kes tifa xwe dialîse?**
- Ma mirov li soza xwe diqulibe?

**Nizanim kefa sabûnê bikeve çavê min:**
- Çi dibe bila bibe ezê soza xwe bînim; çi dibe bila bibe ezê alîkariyê bidim te; eger ez nemirim, ezê alîkariyê bidim te.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

Sudoku: Bersiv 77

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | 8 | 7 | 2 | 9 | 6 | 4 | 5 | 3 |
| 9 | 3 | 5 | 7 | 1 | 4 | 2 | 8 | 6 |
| 6 | 4 | 2 | 5 | 3 | 8 | 7 | 1 | 9 |
| 2 | 6 | 8 | 4 | 7 | 9 | 1 | 3 | 5 |
| 4 | 5 | 3 | 6 | 8 | 1 | 9 | 2 | 7 |
| 7 | 1 | 9 | 3 | 2 | 5 | 8 | 6 | 4 |
| 8 | 9 | 6 | 1 | 4 | 3 | 5 | 7 | 2 |
| 5 | 2 | 1 | 9 | 6 | 7 | 3 | 4 | 8 |
| 3 | 7 | 4 | 8 | 5 | 2 | 6 | 9 | 1 |

Sudoku:Pirs 78

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 3 | 8 | | 7 | | 2 | | | |
| | | | | | 8 | | | |
| | | 7 | | | | | 4 | 1 |
| 9 | 3 | | | | 5 | 6 | | |
| 8 | | 6 | 1 | | 7 | 3 | | 2 |
| | | 1 | 3 | | | | 9 | 8 |
| 6 | 7 | | | | | 1 | | |
| | | | 9 | | | | | |
| | | | 8 | | 4 | | 7 | 9 |

## Sûriyê di gelek çerxan re derbas bûye, îro hewcedarî çerxa demokratîkbûnê ye



Dîroka Sûriyê dîrokeke gelek dirêj û dewlemend e. Ji şaristaniyên kevnar heta împaratoriyên mezin, ji serdema Îslamî heta serdema nûjen, Sûriyê her dem roleke girîng di dîroka Rojhilata Navîn de lîstiye. Lê Sûriyê di gelek çerxan re derbas bûye, îro hewcedarî çerxa demokratîkbûnê ye. R-5

## Qeydkirina jinê di bin navê kevneşopiyê de

Her çendî serdema heyî pêşketiye jî, lê kevneşopiyên civakî weke kiryarekê li ser jinê didomin. Kevneşopiyeke ku mafê jinê ya rewa tune dike, wê demê ew dibe kiryarek û li ser beden, fikir û hebûna jin, tê meşandin. R-2






## Kevirên giranbuha; Kevirê spî, mermer û granît

Xwediyê Kargeha Dêrikê ya birîna keviran Alî Ehmed diyar kir ku kevirê spî, rûxam û granît ne tenê madeyên xav in, ew wekî pira di navbera xwezayê û şaristaniya mirovî de ne. R-7



## Kurdan bi rêya amûrên xwe yên muzîkê çanda xwe parastine

Amûrên muzîkê yên Kurdî beşek girîng ji nasnameya gelê Kurd e, bi pîrozbahî, xemgînî û qehremaniya gelêrî ve girêdayî ne. Bi rêya muzîka xwe, Kurdan mîrateya xwe ya çandî di nav nifşan de parastiye û piştrast kiriye ku muzîk zimaneke ku dîrok, hest û nasnameya neteweyî ya kûr îfade dike. R-9

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1383 7-Pûşper-2026 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# CIWAN DÎNAMÎKÊN PÊKANÎNA SERKEFTINA ENTEGRASYONA DEMOKRATÎK IN

Ciwan hêza dînamîk a guhertin, veguhertin û nûbûnê ne. Ew bi vîn, perwerde û rêxistinbûnê dikarin civakê ber bi azadî, demokrasî û jiyana komînal ve bibin. Tevlîbûna ciwanan di pêvajoya entegrasyona demokratîk de jî, dikare bibe bingeha serkeftinê. R-4





## Şerê stratejiyan li Ser Rojhilata Navîn û Kurdistanê

Piştî erkdarkirina Tom Barrack weke nûnerê Serokatiya Amerîka ya Surî û Iraqê li Rojhilata Navîn nîqaşên berfireh li ser stratejiya Amerîka ya li Rojhilata Navîn tê meşandin... R-6



Akademiya Jineolojî wekî zanista ku bi çavê jin li xwe vegere
İsyan Karadeniz R-2



Qirkirina nerm; tunekirina şert û mercên domandina jiyanê ye
Idrîs Henan R-4



Oldarên Îslamê û rawişt
Hafiz Ahmet Turhalli R-7



Ji hestê ber bi çalakiyê ve
Remezan Olçen R-9

# Qeydkirina jinê di bin navê kevneşopiyê de

Her çendî serdema heyî pêşketiye jî, lê kevneşopiyên civakî weke kiryarekê li ser jinê didomin. Kevneşopiyeke ku mafê jinê ya rewa tune dike, wê demê ew dibe kiryarek û li ser beden, fikir û hebûna jin, tê meşandin.

**Stêrk Mihemed**

Di nava her welat, civak, gel û neteweke de kevneşopiyên wan yên taybet heye ku bûne mîras ji wan re. Lê belê gelek kevneşopî hişk û di astekê de sînordar mene. Di bin navê kevneşopiyê de jinê bê maf û bê wate dikin. Hin kevneşopî dibin sedema kuştin û tundiya li ser jinê. Kevneşopiyên hişk û zayedperest ku rasterast dibe sedema tunekirina jinê, ji ber tirsa ji civak û axaftina derdor gelek malbat wan kevneşopiyên xwe berdewam dikin. Li tevahî cîhanê û ji ber kevneşopiyên cûda yên ku hêdî hêdî jinê dihelîne bi hezaran jin dibin qurbanî.

**Li her welatekî kevneşopiyên cûr be cûr li ser jinê tê meşandin**

Li Kamerûn, Nîjerya û Afrîqaya Başûr ji bo ku keç "bi zûyî nebin jin" û bala mêran nekşînin, sîngên wan bi kevirên germ têne pelixandin.

Sinetkirina jinan li 28 welatên Afrîqayê û hinek deverên Asyayê tê kirin. Bi birîna beşên organên zayendî re, daxwaza jinê tê kuştin. Ev kiryar dibe sedema mirinê, nexweşiyên giran ên wekî enfeksiyonan û pirsgirêkên derûnî.

Li Çînê Ji bo ku lingên jinan piçûk bimînin, ji zarokatiyê ve dihatin şikandin û girêdan ev yek dibû sedema seqetmayînê û nedihîşt jin ji malê derkeve.

Li hinek civakên li Kenya û Ugandayê, dema mêrek dimire, jina wî wekî mîras ji birayê mêr re dimîne.

Li Nepalê, jin di dema menstruasyonê(nexwaşiya mehane ango regl) de wekî "pîs" têne dîtin û li derveyî malê di kulikên teng û sar de têne girtin.

li Pakistan, Hindistan, Efxanistan û Urdunê jinên ku naxwazin bi darê zorê bizewicin an jî li daxwaza malbatê guhdar nakin, têne kuştin.

Li welatên wekî Efxanistan, Îran û hinek deverên Iraqê, keçên ku dixwazin bizewicin bi darê zorê di bin kontrolên fîzîkî de têne derbas kirin

Li Efxanistanê ev yek ji kevneşopiyên herî hovane ye. Dema di navbera du malbatan an eşîran de dijminatî, kuştin an deyn hebe, keçeke ciwan wekî berdêl an qurbanî didin malbata din da ku şer bisekine. Ew keç di malbata nû de wekî kole tê dîtin û bi salan rastî îşkenceyê tê. Efxanistan niha di cîhanê de yekane welat e ku tê de keçên ji pola 6'an mezintir mafê xwendinê nîne û jin ji piraniya karên giştî hatine dûrxistin. Ev perwerde û aboriya jinê ya ku bingeha hebûna wê ye, tune dike.

Li welatên wekî Hindistan û Pakistanê, heke malbata jinê pereyê têr nede malbata mêr, jin bi tundiyeke giran re rû bi rû dimîne û carinan tê kuştin.

Li Hindistanê jinek ku mêrê wê miribe, bi saxî li ser darbesta mêrê xwe tê şewitandin. Bi vê yekê tê nîşandan ku jin tenê bi mêrê xwe heye eger ew tune be, pêwîstiya jinê jî bi jiyanê nîne.

Zewaca bi temenê biçûk li Bangladêş, Hindistan û Nîjerê weke kevneşopî tê dîtin û rêjeya wê gelek bilinde.

Li Çîn û Hindistanê, ji ber ku kur baştir têne dîtin, fetusên keç têne kurtajkirin an jî keçên nûbûyî têne îhmalkirin.

Li Kirgîzistanê, jin li kolanan têne revandin û bi darê zorê têne zewicandin.

Li welatên wekî Kamerûnê, siingên keçên ciwan bi kevirên germ an darên germ tên şidandin ku mezin nebin. Armanc ji vê yekê ku parastina keçikê bikin da ku mêr bala xwe nedinê, lê ev yek şaneyên laş tune dike.

Li gelek deveran keçên biçûk di bin navê namûsê an aboriyê de tên zewicandin. Li hinek herêman weke Etiyopyayê revandina keçan ji bo zewacê kevneşopiyeke rewa tê dîtin ku jinê bê daxwaza wê dike koleya malekê.

Li Îranê, mêr dikarin ji bo demeke diyarkirî (ji çend saetan heta çend salan) bi jinan re bizewicin ku ev yek wekî bikaranîna fihûşê û binpêkirina mafên jinê tê kirin.

Li hinek welatên wekî Papua Gîneya Nû û Nîjeryayê, jinên pîr wekî sêwir têne gunehbarkirin û dibin hedefa êrîşên komî.

Li welatên wekî Erebistana Siûdî (li hinek deveran hîn heye) û Yemenê, jin wekî "biçûk" (qasir) tê dîtin. Heya ku bav, mêr an birayê wê destûr nede, mafê wê yê geştê, kar û carinan jî yê dermanbûnê tune ye. Ev kevneşopî îradeya jinê ya serbixwe ji holê radike.

Li welatên wekî Yemen, Morîtanya û di kampên penaberan ên Sûriyê de hîn jî gelek e. Keçên di bin 15-18 saliyê de wekî amûrekê ji bo kêmkirina barê aborî yê malbatê têne dîtin û bi darê zorê têne zewicandin.




Li hinek gundewarên Erebî, du malbat keçên xwe bi hev re diguherînin yek keçê dide wê malbatê, ew malbat jî keçê dide malbatê miqabil bêyî ku nêrîna keçan bipirsin. Li vir jin tenê wekî "malekî" ji bo pevguhertinê tê dîtin.

Li Sûriyê gelek kevneşopî hene ku jinê bi awayekî veşartî tune dikin. Pirjinî di nava civaka Sûriyê de gelek li pêşe, zewaca bi temenê biçûk, zewaca bi darê zorê, bihevguhertina jinan û zewcandina keçan bi kurê apê wê re bi darê zorê ku ji dema jidayîkbûna keçê, bav û ap diyar dikin ku ew keç mezin bû dibe ya kurê min be ev weke kevneşopiyekê gelek di nava Sûriyê de tê dîtin.

**Kuştina giyan û saxmayîna laşî**

Di bin navê kevneşopiyên de jin tên qeydkirin û tunekirin. Diyardeya kevneşopiyê ku di nava civak, netew, gel û pêkhateyan de weke sembol û rêbaza wan e, gelek caran jinan tune dikin û dibin sedema kuştina giyana jinê tenê mayîna laş. Ji ber ku di bin navê kevneşopiyê de gelek jin rastî bê mafiyê tên di bin navê ku eger keş biryarê malbetê nemeşîne wê serî bavê xwe daxwe rastî bê mafî, tundî û kuştinê tê. Li gelek civakên kevneperest, jin dema ku li dijî zagonên malbatê derdikeve an daxwaza mafên xwe dike, bi hinceta "namûsê" tê kuştin. Bi darê zorê zewicandina keçên biçûk ku hem zaroktiya wan hem jî pêşeroja wan a perwerdehî û tenduristiyê tune dibe. Gelek diyardeyên wiha di nava civakan de pêşdikevin weke; Qedexekirina perwerdehiyê, xebatê û derketina derve ku jinê dike koleyeke nav malê û dengê wê di civakê de tune dike. Jin wekî "mal" tê firotin an pevguhertin. Heke malbata jinê perê ku jin dide mêr kêm bide, jin di malê de rastî tundiyê tê û carinan bi daxistina asîdê an şewitandinê tê kuştin.

Li gorî edet û biryarên nû, jinek nikare bêyî zilamekî ji malbata xwe ji malê derkeve, biçe bajarekî din an jî serdana bijîşk bike. Ev yek jinê bi temamî li hundurê malê dixwe nava zindanê. Piştî mirina mêr, jin mecbûr dimîne ku bi birayê mêrê xwe re bizewice. Li vir daxwaz û rûmeta jinê tune ye, ew tenê wek "mîrateyek" ku ji malbatê dernekeve tê dîtin. Li hinek civakan xwarinên herî bi feyde (wek hêk an goşt) ji jinan re qedexe ne. Jin û keçên ku herî dawî li ser sifrê rûdinin, rastî kêmxwarinê û nexweşiyan tên. Qedexekirina perwerdeyê û xebatê jinê ji qada civakî derdixe. Jina ku perwerde nebûye û aboriya wê nîne, wekî îrade tune dibe û dibe girêdayî zilam. Ev test rûmeta jinê û mafê wê yê li ser bedena wê tune dikin. Jina ku vê testê derbas nake carinan di civakê de tê reşkirin an jî bi kuştina namûsê tê cezakirin.

**Li gorî hemû pêşketinan paşverûtiya zihniyetê**

Cîhan di gelek waran de pêşketiye weke; teknolojî, zanistî, wêjeyî û hwd… lê belê li beramberî wê zihniyeta zayendperest, kevneperest û paşverû li gorî hemû pêşketinan xwe didomîne. Kevneşopiyên çawt li bermaberî mafê jinê bi sedê salane xwe didomîne û xwe derbasî nifşên pêşerojê jî dike. Zihniyeta baviksalar ku bi sedê salane di nava civakê de pêşketiye û dema me ya îro de xwe berfireh û kûrtir dike. Bi rêya kevneşopiyên hewaldidin ku jinê di nava sînor û qaliban de bihêlim. Da ku jin nebe xwedî deng û zanist. Çiqas civak di warê zanist, fikir û tekonolijiyê de xwe pêş bixwe ewqas kapîtalîzm li kêlekî wê xwe bi pêş dixwe. Ev jî bandoreke wê ya mezin li ser zihmiyeta mirovan dike ku dihêlê di warê zihniyeta kûjer, paşverû û zayendperest de xwe kûr bike û jin dibe qurbaniya vê zihniyetê .

## Akademiya Jineolojî wekî zanista ku bi çavê jin li xwe vegere

Akademiya Jîneolojî

İsyan Karadeniz

Di pirtûka Notên Dersa Jineolojî de ji bo na arkeolojiya jin pênaseyekê wûha heye; Girên ku ji dûr ve wekî girên biçuk xuya dikin û ji aliyê arkeologan ve tên kolandin, di her qonaxê de çand û şaristaniyeke cuda derdixin pêşberî mirov. Hûn dinêrin ku di binê wan girên piçûk de qesrên bêhempa yên mezin, berhemên ku keda destan û roniya çavên bi hezaran salan in derdikevin holê. Ji cerê şikestî, kevirekî nexşandî yan jî mayîna dîwarekî, dîrok li ber çavên we şiklê xwe digire. Arkeolojiya jinê jî rêbazek e ku şopandina şopên avabûna nasnameya jinê pêkan dike. Rêbazeke lêkolînê ye ku derbarê lêkolînkirina jinê wekî girêdana kirde-bireserê ye. Arkeolojiya ku lêkolînên dîrokî dihewîne, dema ku şopên avahiyên madî û çandî yên ku mirovan li pey xwe hiştine lêkolîn dike û şîrove dike, pênaseya arkeolojiyê ya ku em bikar tînin ne tenê danahevên madî, danahevên ramanî jî lêkolîn dike. Şêwazekî lêkolînê ye ku tê de etîmolojî, mîtolojî, arkeolojî û antropolojî, dîn, wêje, huner û kevneşopiya devkî digihêjin hev. Di vê xalê de, di têkoşîna tevgera azadiya Kurdistanê û tevgera jinê de pileyeke vî rengî ya berikandin û tecrûbeyê ava bûye. Îdiaya Rêber APO a li ser sosyolojiya jinê jî bi vê berikandinê şiklê xwe girtiye. Rêbazeke lêkolîna sosyolojîk e ku tê de analîza rastiya civakî ya ku jin jê hatine, bidestxistina hişmendiya wê û pratîkbûna vê hişmendiyê bi berdewamî tê pirsîn.

Di dîrokê de jinan di serdema klan, kabile, heta roja iro gellek beşên civakê de bu ne hêza afrinêr, bi rola pêşengtiyê rabu ne lê ev yek pir caran rast lê berovajî kirinê hatine; yan ne hatiye nivisandin an jî dema ku hatî nivisandin naveroka wê hatiye vala kirin, ji eslê xwe hatiye dûr xistin. Jinên Şifager bune pirabok, jinên zana bune şaytan, jinên xwedî lêgerîn û bi meraq wek jinê xirab hatiye bi nav kirin, bi hezaran jin hatine qetil kirin. Li dijî Katilê kastik berxwedan û têkoşina jinan her tim hebu ye, her çiqas heya roja iro tene wek damarekî berxweder mayî be jî her dem di mekanekî cuda de derketiye pêşberî dirokê. Ji çanda komkirina giyayan dayikên Pîr/Zana/ Şifager, jî kevneşopiya Tavananna a Kibeleyê heya jinên rahibe ya manastiran jî Aborjin heta jinên Amazonan bi rêxistinbunên xwe yên di aliyê parastin, aborî û parvekirina zanistiyê de kombuyinên jinan pêşketi ye. Akademiya Jineolojî wekî zanista ku bi çavê jin li xwe vegere. Jinan bi hişmendiya çanda dayikê ji bo avakirina hebunê xwe perwerde dikir. Îro jî li Akademiya Jineolojiyê li ser vê axê qedim disa kombuyinekî jinan heye. Ji xebatên cuda cuda ji bo na fêm kirin û kûrbuna di Manifestoya Civaka Demokratik û Aşitiyê dewreyekî perwerde hatiye vekirin. Cihê ku jin xwe zana dike, beramberi her cure êrişên katilê kastik têdikoşî; li vir ast û rewşa civakê jî diguherî. Pirsgireka esasî ya bingeha civakê nakokiya di navbera her du zayendan wek jinê kole û zilamê kurnaz tene bi awayekî li xwe veger/ xwebunê bi rê ya xwe perwerde kirinê ve dikarin werin çareser kirin. Diroka derewîn a ku ferî me kirine, hişmendiya ku li ser me hatine ferz kirin, cilê kapitalizmê ku li me kirine êdi li ser me runane. Bi manifestoya Civaka Demokratik û Aşitiyê ve jiyana kominal a bi şewaza komin çawa were pêkanin dê di vê dewrê de were niqaş kirin. Bi rêbazê Jineolojîk xwendin û lêkolin kirina Manifastoyê bi xwe re jinerjiyekî xurt bide avakirin. Encama ku derkevê holê demên pêş werin parve kirin.



# Koriya Bakur hilberîna Uranyomê du qat zêde kiriye

Serokê Koriya Bakur Kim Jong Un ragihand ku welatê wî di pênc salên dawî de hilberîna Uranyom ku di çêkirina çekan de tên bikaranîn ji du qatan zêdetir kiriye.



**Navenda Nûçeyan**

Serokê Koreya Bakur Kim Jong Un roja çarşemê di dîroka 4'ê Hezêrana 2026'an de ragihand ku hilberîna materyalên nukleerî di pênc salên dawî de ji du qatan zêdetir bûye, herwiha tekezî li ser xurtkirina şiyanên nukleerî yên leşkerî di nava pilanên demdirêj û ji bo pêşxistina pergala astengkirina statîjîk de, kir.

Li gorî Ajansa Nûçeyan a Navendî ya Koreya Bakur, ev daxuyaniyên Kim di dema seredana meydanî ya tesîseke hilberîna materyalên nukleerî de ku vê dawiyê dest bi xebatê kiriye, hat kirin.

Serokê Koreya Bakur diyar kir ku pêşketina ku welatê wî di vî warî de bi dest xistiye, guhertinek mezin di rêya bernameya nukleerî de temsîl dike. Di heman demê de destnîşan kir ku planên wan ên pêşerojê ji bo pêşxistina şiyanên nûkleerî û xurtkirina pergalên parastinê yên dewletê, hene.

**Pêşketina berdewan ji bo pêşxistina şiyanên nûkleerî**

Serokê Koreya Bakur Kim tekez kir ku welatê wî xurtkirina hêza xwe ya nûkleerî wekî pêşanîyek stratejîk dibîne û destnîşan kir ku tiştên ku di salên dawî de hatine bidestxistin qonaxek girîng di pêşxistina bernameya nûkleerî ya Koreya Bakur de pêk tîne.

Wî Serokê Koreya Bakur Kim Jong Un zêde kir ku berfirehkirina hilberîna materyalên nûkleerî di çarçoveya vîzyonek berfireh de tê, armanc dike ku asta amadebûna leşkerî bilind bike û şiyanên astengkirinê li hember pirsgirêkên ewlehiyê yên ku welat pê re rû bi rû ye xurt bike. Pyongyang di helwesta xwe ya redkirina rawestandina cebilxaneya xwe ya nukleerî de didomîne, ji ber ku hebûna çekên nukleerî garantiyek bingehîn ji bo ewlehiya neteweyî û parastina serweriya wê, dihesibîne.

**Nakokiya berdewam bi Dewletên Yekbûyî re**

Koreya Bakur tevî ambargo û zextên ku ji aliyê Dewletên Yekbûyî û hevalbendên wê ve tên kirin, bangên navneteweyî yên ji bo ku dev ji bernameya xwe ya nûkleerî berde, red dike.

Desthilata Koreya Bakur dibêje ku şiyanên wan ên nûkleerî tedbîrek parastinê ye li dijî tiştê ku ew wekî gefên leşkerî ji Koreya Başûr û hêzên Amerîkî yên li herêmê bi cih bûne, dibînin.

Mijara dosyaya nûkleerî bi dehan salan e yek ji xalên sereke yên aloziyê li Nîvgirava Koreyê ye, di çarçoveya binketina hewldanên dîplomatîk ji bo gihîştina rêkeftineke mayînde li ser bêçekkirina nûkleerî.

**Dîrokek ji cezayan û tecrûbeyên nukleerî**

Koreya Bakur di sala 1993'an de ji Peymana Qedexekirina Belavbûna Çekên Atomî vekişiya û ji wê demê ve bernameya xwe ya nukleerî û leşkerî pêş dixe.

Pyongyangê di deh salên borî de şeş tecrûbeyên nûkleerî pêk anîne, ku ev yek bûye sedema dorpêçên berfireh ên navneteweyî û yên NY li dijî wê.

Gelek welat bernameya naûkleerî ya Koreya Bakur wekî gefek li ser ewlehî û aramiya li Rojhilatê Asyayê dibînin, di heman demê de Pyongyang destnîşan dike ku çalakiyên wê di çarçoveya mafê wê yê parastina xwe de ne.

**Testên leşkerî yên berdewam**

Daxuyaniya Kim piştî rêze tecrûbeyên leşkerî yên ku Koreya Bakur di demên dawî de pêk anîne, tê. Pyongyang hefteya borî jî ragihand ku wan sîstemeke nû ya avêtina roketên piralî yên sivik, herwiha sîstemeke mûşekên krûz ên taktîkî ceribandiye.

Beriya van tecrûbeyan jî, raporên ji Koreya Başûr hatibûn belavkirin ku di gera herî dawî ya tecrûbeyên leşkerî yên ku Koreya Bakur îsal pêk anî de, çend mûşek, di nav de mûşekek balîstîk jî, ber bi perava rojava ve hatine avêtin.

Ev geşedan nîşan didin ku Pyongyang bi berdewamiya şiyana xwe ya leşkerî digel berfirehkirina bernameya xwe ya nûkleerî hevdem e, di çarçoveya domandina rageşiyên herêmî û nakûkiyên bi Dewletên Yekbûyî û hevlabendên wê re.

# Cotkarên kartolan li Ewropayê ziyanên madî yên mezin dibînin

**Navenda Nûçeyan**

**Li gorî raporek di "The New York Times" de hatiye weşandin, cotkarên kartolan li Belçîka mehan e bi hezaran ton ji berhemên kartolan diavêjin û di encamê de ziyanên madî yên mezin dibînin.**

Di gaveke kêmdîtî de, cotkarekî Belçîkî vê mehê neçar ma ku dîsa berhema xwe ya kartolan biavêje nava zeviyên xwe li rojhilatê Belçîkayê, ev rêya herî erzan ji bo ku xwe ji mîqdarên mezin xelas bike, ku têra hilbirîna nêzîkî 200 milyon firingiyên kartolên qelandî dikir.

Belçîkî Dehayeri bi tenê bû; cotkarên din jî heman vebijarkê bikar tînin, di demekê de ku Ewropa bi zêdebûneke ku tê texmînkirin bi qasî 5 mîlyon ton kartol di hilberîna kartolên ku ji ji bo qelanidinên tê bikar anîn, rû bi rû ye. Ji berî çend mehan ve, buhayê tonek kartol li bazara Belçîkayê ku mezintirîn hinardeya cîhanê ya kartolên qelandî ên cemidî ye - sifir e. hêjayî gotinê ku berî sê salan nêzîkî 600 euro bû.

**Sedemên li pişt kirîzê**

Zêdebûna mezin a kartolan di sala 2026'an de ji ber tevlîheviyek faktorên hevbeş e, hin ji wan avhewa û hin din jî jeopolîtîk in.

Di 8 salên dawî de, şert û mercên hewayê yên baş bûn sedema bidestxistina mezintirîn berhema kartolan li Ewropayê, di demekê de ku cotkar ji ber bacên ku ji hêla rêveberiya Serokê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê Donald Trump ve li ser hawirdekirinê hatin ferzkirin, herwiha hatina kesên nû ji Asyayê ku beşek ji bazarê girtine, ji bo firotina berhemên xwe zehmetî dikişandin.

Di demên dawî de jî, şerê li Îranê bû sedema zêdebûna lêçûnên enerjî û gubreyan, ku di encamê de xerîdar neçar man ku lêçûnên xwe kêm bikin û bi vî rengî zext li rêjeyên qezencê bûn yên ku ji xwe teng bûn.

**Ziyanek mezin û kêmkirina rûberên çandiniyê**

Li gorî rojnameya "New York Times", cotkarê Belçîkî Dehayeri ku temenê wî 58 salî ye got: "Bê guman rewş xirab e, lê jiyan ev e." Wî diyar kir ku kartolên ku nehatine firotin dest bi mezinbûnê kirine, ev yek dihêle ku firotina wê ne mumkune be, herwiha li gotinên xwe zêde kir ku ji ber lêçûna xakê, tov, gubre û xebatkaran, windahiyên wî gihîştine nêzî 160 hezar euro.

Cotkar ji bo demsala bê rûbera çandinina kartolan kêm kir heya 17 donimî, li gorî 170 donimî ku bi gelemperî di zeviya wî ya 370 donimî ya li Hermalsu-Hoi, de ye.

Li Almanya jî, cotkarekî din ku 4 hezar ton kartolên nexwestî çandibû, bi awayekî cuda rû bi rûyê krîzê bû û li Berlînê kampanyayên belavkirina bê dirav li dar xist, ku niştecihên wê wekî "zêdebûna kartolê" bi nav kirin.

**Belçîka di navenda kirîzê de ye**

Lê bandora herî mezin li Belçîkayê, ku mezintirîn hinardeyê cîhanî yê kartolên qelandî ên cemidî, tê dîtin. "Firits" li welêt semboleke neteweyî ye, erebeyên firotina wan li meydanên giştî pir belav in, li wir bi cûrbecûr sosên wekî Andalus û Dallas re têne pêşkêşkirin.

Li gorî rapora dawî ya New York Times, hinardekirina kartolên pijandî û cemidî yên Belçîkayê di sala 2025'an de gihîştiye nêzîkî 3.3 milyar dolarî, ku ev hejmar nêzîkî sê qat ji asta deh sal berê zêdetir e, lê belê, li gorî raporê domandina vê mezinbûnê di serdema pêş de dijwartir xuya dike.

**Şer û enerjî zextê li ser bazarê dikin**


Christophe Vermeulen, serokê komeleya hilberînerên kartolan ên Belçîkî (Belgapom), ji rojnameya The New York Times re diyar kir ku şerê li Îranê zextên nû li rêzedabînkirinê zêde kiriye

Lêçûnên bilind ên enerjiyê lêçûnên sarkirin û veguhastinê zêde dikin, herwiha buhayên gubreyan bi awayekî mezin bilind bûne, di demekê de ku keştiyên ku bi madeyên wê yên barkirî ne, ji ber girtina Tengava Hurmuz, nikarin ji Kendavê derkevin.

Di heman denê de ev girtin hinardekirina kartolên qelandî bo welatên Kendavê, ku bazarên sereke ne, dijwar kiriye, di demekê de ku tê payîn daxwaz ji ber kêmbûna hejmara geştiyaran kêm bibe.

**Kêmbûna daxwaza cîhanî**

Li hundir, zêdebûna enflasyonê li Ewropayê lêçûnên xerîdaran li ser xwaringehan kêm kiriye, ku piraniya kartolên qelandî li wir têne xwarin.



Baca Dewletên Yekbûyî bandor li ser hinardekirina kartolên Ewropî jî kiriye, ku DYA piştî Birîtaniya duyemîn bazara herî mezin e. Hinardekirin heta dawiya Sibatê li gorî sala borî ji sedî 8 kêm bûye.

Firotina bo Erebistana Siûdî, sêyemîn bazara herî mezin, ji sedî 11 kêm bûye û ji destpêka şerê bi Îranê re tê payîn ku kêmbûnek din jî dê çêbibe.

**Zêdebûna pêşbaziyê di bazaran de**

Herwiha hilberînerên Ewropî bi pêşbaziyek zêde ya welatên wekî Çîn, Hindistan û Misrê re rû bi rû ne, ku dest bi hinardekirina kartolên qelandî bi buhayên pir kêm kirine.

Her çend hinardekirina van welatan hîn jî ji sedî 10 tevahî hinardekirina Ewropayê temsîl dike, sala borî ew du qat zêde bû.

Analîst destnîşan dikin ku pêşbazî êdî ne tenê li ser kalîteyê ye, lê di heman demê de li ser buhayê jî ye, nemaze ji ber zexta li ser marjên qezencê.

**Reftarên xerîdaran hatine guhertin**

Ev pirsgirêk bi guhertinên avahîsaziyê yên di daxwazê de re hevdem in, ji ber ku xerîdar ber bi hilbijartinên xwarinên tenduristtir ve diçin.

Li Dewletên Yekbûyî, nêzîkî yek ji heşt kesên mezinan ragihand ku dermanên kêmkirina giraniyê ên wekî "Ozempic" bikar tînin, ku xwesteka xwarinên qelandî û çêkirî kêm dike.

Her çend daxwaza gerdûnî ya ji bo kartolên qelandî berdewam dike, leza wê salane daketiye ji sedî 2.5, li gorî ji sedî 5 di pênc salên berê de.

**Pêşerojeke nediyar**

Hin cotkar dibînin ku krîz dibe ku demkî be, lê yên din kêmtir geşbîn in. Cotkarekî Belçîkî got ku ew hêvî dike ku di pêşerojê de zeviya xwe bide keça xwe, lê Dehayeri nêrînek nebaş nîşan da û got, "Ez bawer dikim ku salên baş bi dawî bûne."

# Lihevkirinên Şam-Moskovayê: Pergala kevn tê nûkirin û Sûrî ji mafên xwe bê par dimînin

**Cemîl Xoce**

Tiştê ku îro di navbera Şam û Rûsyayê de diqewime, berdewamiya siyaseta kevn e. Hêzên mezin bêyî ku ji sûriyeyiyan bipirsin, çarenûsa wan bi tena xwe diyar dikin. Piştî guhertinên siyasî yên mezin ên di dawiya sala 2024'an de, rêveberiya demkî ya li Şamê bi Moskovayê re li ser mayîna baregehên leşkerî yên Rûsyayê li "Hmeymim" û "Tartusê" li hev kir. Ev peyman piştrast dike ku zihniyeta navendîbûnê û piştbestina bi hêzên derve ve hîn jî serdest e, li şûna ku li çareseriyeke niştîmanî ya rasteqîner bigere ku mafên hemû herêm û pêkhateyên civaka Sûriyeyê bi rêya pergaleke demokratîk a nenavendî ku gel hêzdar dike, garantî bike.

### Balafir û Keştî: Ji bo sepandina rastiyeke leşkerî

Keştiyên barhilgir ên rûsî yên ku digihêjin bendera Tartusê û balafirên leşkerî yên ku li baregeha hewayî ya Hmeymim dadikevin, ne tenê piştgiriyeke normal e. Ew hewldaneke eşkere ya Rûsyayê temsîl dike ku rastiyeke leşkerî li Sûriyeyê ferz bike. Rûsya dixwaze axa Sûriyeyê wekî rawestgehekê bi kar bîne, da ku bandora xwe li Afrîka û Rojhilata Navîn berfireh bike. Ev rasterast bi ramana ku Sûriye dewleteke azad û bi rastî serwer e re nakok e, ji ber ku serwerî ji hêla gel ve tê afirandin, ne bi rêya peymanan bi artêşên biyanî re tê dayîn.

Pevguhertin: "Elektrîk û sotemenî" li hember "Erd û biryarê"

Lihevkirina nû mîna bazirganiyekê ye; Rûsya petrol û sotemeniyê dişîne û alîkariya çakkirina torên elektrîkê û rêyên ku di şer de wêran bûne dike, li hember vê yekê, mafê mayîn û kontrolkirina bingehên leşkerî ji bo salên dirêj werdigire. Ev pevguhertin rîskên mezin dihewîne:

Radestkirina dewlemendiyên welat: Radestkirina sektorên enerjî, elektrîk û saziyan ji bo kompanyayên Rûsî tê wê wateyê ku aboriya Sûriyeyiyan her girêdayî derve bimîne û rûniştvanan ji birêvebirina dewlemendiyên xwe bê par dike.

Sepandina kontrola ewlehiyê ji paytextê:

Di peymanê de hatiye diyarkirin ku Rûsya dê li baregeha Hmeymîmê artêşa Sûriyeyê ji nû ve perwerde bike û bi rêxistin bike. Ev tê wateya ku Şam dixwaze vegere serdestiya ewlehiyê ya navendî ya tund û hêzên herêmî yên ku herêmên xwe bi salan e parastine û şerê terorê kirine, paşguh bike. Reva ji çi çareseriyeke rasteqînî: Tekeziya li ser razîkirina Rûsya û baregehên wê, hewleke ji bo nepêkanîna biryarên navdewletî û paşxistina her çareseriyeke siyasî ya giştgirtî ku hemû Sûriyeyiyan bîne cem hev.

### Rûsya tenê li pey berjewendiyên xwe dikeve

Dema ku Amerîkayê hebûna xwe ya leşkerî li Sûriyeyê di destpêka sala 2026'an de bi dawî kir, valahiyeke mezin li dû xwe hişt û Rûsyayê tavilê destwerdan kir da ku wê valahiyê bi kar bîne. Ya balkêş li vir ew e ku hêzên Rûsî ji hinek herêman li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê (mîna firokexaneya Qamişlo ya leşkerî) vekişiyan û hemû giraniya xwe li perava Sûriyeyê (Hmeymîm û Tertûs) kom kirin. Ev vekişîn îsbat dike ku Rûsya ne xema parastina hemû xaka Sûriyeyê ye yan dabînkirina aramiyê ye ji bo herêmên ku rûbirûyî xetereya şaneyên DAIŞ'ê dibin, lê tenê parastina berjewendî û baregehên xwe yên li ser deryayê ji bo wê girîng e.

### Binpêkirina mafên qurbaniyan di bin navê "Lihevhatinê" de

Tevî ku Şam hewl dide peymanê xweşik bike û dibêje ku Rûsya dê di "Edaleta Veguhêz" de alîkariyê bike, lê rastî berevajî vê yekê dibêje. Çawa dikare ew aliyê ku ji sala 2015'an ve bajar û bajarokên Sûriyeyê bi balafirên xwe bombebaran kiriye û bûye sedema kuştina hezaran sivîlan û wêrankirina nexweşxaneyan, bibe parêzvanê edaletê? Raporên navdewletî ev sûc belge kirine û nabe ku xwîna qurbaniyan û mafên malbatên wan bi peymaneke siyasî bêne jêbirin. Edaleta rasteqîn hewceyî hesabpirsîneke navdewletî ya zelal e, ne dayîna parêzbaniyê ji kesên ku beşdarî şer bûne re.

### Hevalbendiyeke kevin bi rûyekî nû

Di encamê de, tiştê ku îro diqewime, ne hevalbendiyeke nûye, lê ji nû ve avakirina sîstema navendî ya kevin e bi rûyên nû yên pragmatîk ku li gora sala 2026'an in. Hewla guhertina Sûriyeyê ji bo ku bibe tenê rawestgehek yan rêyeke bazirganiyê ji bo xizmeta berjewendiyên navdewletî, tu carî aramiyê nayîne. Aramiya rasteqîn û tenê wê demê dest pê dike dema ku hemû artêş û baregehên biyanî ji welat derkevin û Şam mafê herêman di birêvebirina karûbarên xwe de bi awayekî xweser nas bike, da ku Sûriye bibe dewleteke demokratîk û nenavendî ku tê de dewlemendî û desthilatdarî bi edalet li ser hemû welatiyan dabeş bibe.

Hesabên nû yên di navbera Şam û Moskovayê de li ser baregehên leşkerî "lihevkirineke ji jor ve ye" ku tenê xizmeta berjewendiyên dewletên mezin dike. Di vê peymanê de erd û dewlemendiya Sûriyeyê bi sotemenî û elektrîkê hatine guhertin. Ev lihevkirin daxwazên gelê Sûriyeyê yên ji bo birêvebirina herêmên xwe paşguh dike û hewl dide mafên qurbaniyên ku di encama bombardûmana Rûsyayê de di salên borî de jiyana xwe ji dest dane, bide aliyekî.

# Demokrasî dermanê her tiştî ye!

**Volqan Elî**

Di roja me ya îro de li Bakur û Tirkiyê pêvajoyek heye: Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk. Lê belê hebûna vê pêvajoyê nayê maneya ku wekî tê xwestin dimeşe û ti astengî û kelem li ber wê ranabin. Di aliyekî de ev rewşeke asayî ye. Çima rewşeke asayî ye? Bersiva vê bi xwe di nava pirsê de ye. Çima wisa ye?

Ya destpêkê; eger em pirsgirêka Kurd û Kurdistanê ji sedsala 19. ve (herî kêm ji bo Tirkiyê û Osmanî) bigirin dest, ev zêdetirî du sed sal e ku ne hewldanên îmha û înkarê yên li ser gelê Kurd û ne jî berxwedana gelê Kurdistanê bi dawî bûye: Encam mewteyê civaka Kurdistanê… Ta ku Tevgera Azadiyê ya Gelê Kurd dest bi tevgera azadkirina gelê Kurd û Kurdistanê kiriye.

Sedema bingehîn a duyemîn ew e ku ev pêvajo wisa bi giranî dimeşe; Komara Tirk herî kêm ji piştî Serhildana Şêx Seîdê Kal pêve, stûnên xwe yên dewletê, stûnên xwe yên civakî li ser esasê nijadperestî, neteweperestî, yekparêzî, yekolî, yekmezhebî, yekalî û hwd hwd lê kiriye. Çawa ku tê gotin 'jiyana rast bi şiklekî şaş nayê jiyîn', berewajiya vê gotinê jî rast e: Yanî jiyaneke şaş, ku hîmê wê şaş hatiye lê kirin tu bixwazî jî bi şiklekî rast nayê jiyîn. Yanî maneya vê gotinê çi ye, em ê ji vê gotinê çi fêm bikin? Wekî ku me di destpêkê de gotiye, niha li Bakur û Tirkiyê pêvajoyek dimeşe (yan jî nameşe). -Jixwe bandora vê bi erênî û neyînî li ser her çarparçeyên Kurdistanê û her çar dewletên dagirker çêdibe û dê çêbibe jî- Ji ber sedemên ku me li jor anîne ziman, niha di vê demê de dewleta Tirk eger bixwaze jî vê pêvajoyê wisa nikare pir bi rehetî bimeşîne. Jixwe em dizanin ku zêde niyeteke wê ya baş jî tine. Lê bila…

Em bihesibînin ku Erdoğan, Bahçeli, İyi Parti, Kılıçdaroğlu û hemû zilam û hêzên payeberz ên dewleta Tirk, şevekê ji şevan xewneke baş bibînin. Û wê sibeyê bi kêfxweşî hişyar bibin û bibêjin; "Wêy Tirk û Kurd ji kengî ve xwîşk û bira ne! Tirkiye û Kurdistan welatê me yê hevbeş e" û filan û bêvan. Wê rojê çi dê biqewime hûn dizanin?! Piraniya civaka Tirk û erkanê dewletê yê mayê dê dijî dewleta Tirk dest bi şer bikin. Û Kurd û Kurdistanî jî dê ji vê bûyerê nesîbê xwe bigirin, caltaya dil dê li hemûyan bide. Hêviya min ew e ku Kurd û Kurdistan vê caltaya dil bi rehetî derbas bike. Jixwe zehmet e ku bûyereke wisa biqewime, lê em dixwazin çi bêjin: rewş ewqas zehmet e, di xalekê de asê maye (bi gotina gelê me yê Botanê 'gêro bûye'). Hişmendiya faşîst û yekperest a dewleta Tirk wisa lê kiriye ku hemû civaka xwe, hemû derdorên xwe yên di nava îdareya dewletê de cih digirin, wekî ku mirovek bi seretanê bikeve, bi nexweşiya desthilatperestî, yekperestî, partîperestî, navendperestiyê xistiye. Lewma di van rojên dawî de li ser serê CHP'ê fermana Erdoğan bi destê Kılıçdaroğlu rabûye.

Erdoğan çi kiriye? Qaşo CHP'ya ku partiya avaker a Komara Tirkiyeyê ye xistiye binê dorpêçê. Hema bêje xistiye bin linge xwe û bi paniya xwe qiriqa wê diperçiqîne. Sedem çi ye? Ne ti tişt e! Lê li gorî hişmendiya demokratîk wisa ye. Eger me karibûya ji Erdoğan sedema vê bipirsin dê wisa bigota; "ma ez ti tiştê ne li rê nakim. Hemû hewldana min ji bo pêşeroja dewleta me ya alî ye. Di dema xwe de Fatihê Stenbolê, Siltan Mehmet jî ji bo pêşeroja dewleta Osmanî di şevekê de 19 birayên xwe îdam kiribûn. Rehma xweda li wî be!"

Lê ne em dikarin xwe bigihînin Erdoğan û ne jî ew niha çi bi serê CHP'ê aniye rast nabêje. Çi dibêje Erdoğan? Dibêje; "ti elaqeya me bi bûyerên di nava CHP'ê de diqewimin re tine. Eleqaya me nabe û dê nebe jî". Lê rastî ne wisa ye! Bêyî AKP niha di nava burukrasiya dewleta Tirk de zilikekî herî piçûk ji şûna xwe nalebite! Ji ber vê yekê ye ku dozgeriyê kongreya CHP ku têde Özgür Özel bûbû serokê CHP batal kir. Di rewşeke asayî de di dewleteke li ber demokrasiyê rêzê digire de tiştekî wisa naqewime! Ti heqê ti dozgeriyê jî tine. Êdî di nava dewleta Tirk de çi hesab, çi nîqaş hene em bi temamî pê nizanin. Lê ji ber hin helwestan xuya dibe ku di heman mijarê de Bahçeli wekî Erdoğan-AKP nafikire. Herî kêm di dîmenê de (bi gotinê) de wisa xuya dibe. Bahçeli dibêje; CHP'ê bila vê payizê kongreya xwe li dar bixe, bila ji bo vê yekê dozgerî destê xwe zû bigire" û hwd. dizane ku eger CHP konreya xwe li dar bixe, bi îhtimalekî mezin Özgür Özel dubara dê bibe serokê CHP'ê û lîstoka Erdoğan dê têkbiçe. Xuya ye Bahçeli naxwaze rewş aloztir bibe. Heta dibêje, "nebaş e ku bûyer bikevin di nava kolanan de". Eger ev ne siyaseteke dewletê ya polîsê xirab-polîsê baş be, Bahçelî dixwaze pêşî li yekperestî û îqtîdarperestiya Erdoğan-AKP bigire; yan jî dixwaze destên ji derve yên îhtimal heye rola wan di van bûyeran de hene, asteng bike!

Kîjan îhtimal rast dibe bila bibe, xuya ye tiştê ku li pêşiya Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk dibe asteng û nahêle (ev salek zêdetir e) bimeşe jî heman tişt e. Ji ber vê yekê hewce dike em nebêjin jixwe CHP partiya avaker a dewleta Tirk e me çi jê ye; çi ji hev dikin bila bikin! Xwîn û keda bi dehezaran şehîd girêdayî bi serkeftina vê Pêvajoyê ye! Astengiyên li ber her duyan jî heman astengî ye: dûrbûna dewlet û civaka Tirk ji demokrasiyê…



# Pênc sal ji desthilata Talîban; Afganistan di nav qeyrana maf, azadî û jiyanî de dixeniqe

**Bi derbasbûna pênc salan ji desthilata Talîban, Afganistanê bi qeyraneke kûr a civakî, aborî û mafê mirovan re rû bi rû ye. Di bin navê pêkanîna şerîeta Îslamê de jin tên hedefgirin, tecawizkirin û ji mafên xwe yên bingehîn bêpar dimînin.**

**Şaho Xanim/Qamişlo**

Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê piştî 20 salan ji kontrolkirina Afganistanê û şerê li dijî tevgera Talîban a Isalmî a radîkal, di 30'ê Tebaxa 2021'an de vekişîna xwe ya leşkerî ji Afganistanê temam kir, bi vî awayî şerê xwe yê biyanî yê herî dirêj bi dawî kir.

Di Tebaxa 2021'an de, piştî vekişîna DYA, Talîban desthilatdarî desteser kir û Afganistan wekî mîrinşîna Islamî ragihand. Bi desthilatdariya Talîban re rewşa Afganistan her ku çû xerabtir bû. Bi derbasbûna 5 salan li ser hikmê talîban, binpêkirinên mafê mirovan, bi taybet kiryarên li dijî jinan, hejarî û nearamî taybetmendiyek diyarker a vê tevgerê dimînin.

### Rewşa ewlehiyê

Rewşa ewlehiyê li Afganistanê pir ne aram e û tevlîheve. Welat ji bilî xetereyên revandin û girtina keyfî, ji rêjeyek bilind a sûcên asayî jî dikişîne. Ji ber vê rewşa ne aram, piraniya hikûmetên Rojavayî hişyarîyên rêwîtiyê yên hişk didin û hişyarî didin welatiyên xwe ku ji neçin Afganistanê.

Her çend Talîban kontrola piraniya welêt diparêze jî, ew bi êrişên berdewam yên komên çekdar ên li dijî Talîban û sivîlan rû bi rû dimîne. Rêxistina terorî (DAIŞ-Xorasan) gefa herî mezin li dijî Talîban e. Ev rêxistin cihên giştî, mîsyonên dîplomatîk, cihên îbadetê û navendên hikûmetê hedef digire. Di çileya 2026'an de di êrişeke xwekujî a (DAIŞ –Xorasan) a li diî xwaringehkê ku kesên biyanî û bi taybet çînî sedana wê dikin de, bi dehan kes hatin kuştin û birîndar bûn. Herwiha komên din, wekî El Qaîde jî hene û li dijî artêşa Talîban bi awayekî domdar êrişan pêk tînin.

Li aliyekî din jî herêmên sînor ên di navbera Afganistan û Pakistanê bi awayekî domdar rageşî û pevçûnên çekdarî yên demkî dijîn.

### Rewşa aborî

Asta hejariyê li Afganistanê her ku diçe xirabtir dibe, nêzîkî 28 milyon kes nikarin pêdiviyên xwe yên herî bingehîn bidest bixin. Ev xirabûn bi zêdebûna bilez a nifûsê ve girêdayî ye ku ji mezinbûna aborî ya kêm derbas dibe, digel sînorkirinên li ser kar, kêmbûna alîkariya navneteweyî û bandora giran a guherîna avhewayê.

Ofîsa Neteweyên Yekbûyî ji bo Koordînasyona Karûbarên Mirovî (OCHA) texmîn dike ku nêzîkî 22.9 milyon kes di nav kêmasiyên mezin ên fînansmanê û kêmasiyek giran a budceya alîkariya navneteweyî de hewceyê alîkariya mirovî ya bilez in. Di heman demê de ji sedî 42 ji nifûsê di bin xeta xizaniyê de dijîn.

Herwiha Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê hişyar da ku 3.5 milyon zarok di xetereya kêmbûna xwarinê de ne û krîza hejariya xwarinê di nav zarokên di bin du salî de xirabtir dibe.

Rêjeya bêkariyê li Afganistanê gihîşt ji sedî 13.35, ji ber ku aboriya wê ji ber tecrîda navneteweyî, kêmbûna alîkariya biyanî û vegera bi sed hezaran koçberan rastî krîzeke giran hat. Piraniya mezin a hêza kar (ji sedî 60-80) xwe dispêre sektora çandiniyê.

### Rewşa jinan

Efganistan li ser asta cîhanê yek ji welatên herî zêde ku li dijî jinan binpêkirin tên kirin. Rewşa jinan li Afganistanê bi krîza mafên mirovan a herî xirab a cîhanê tê binavkirin.





Ji ber ku Talîban sînordarkirinên sîstematîk ferz dike ku armanc dike jinan bi tevahî ji jiyana giştî dûr bixe û wan ji mafên wan ên herî bingehîn ên perwerde, kar, azadiya tevger û derbirînê bêpar bihêle.

Li Afganistanê bi mîlyonan keç ji mafê xwe yê perwerdehiyê bêpar dimînin, ji ber ku qedexeya fermî ya qeydkirina wan li dibistanan ji pola şeşan û zanîngehan ev pênc sal in berdewam dike. Jin ji xebata di karên hikûmetê û rêxistinên nehikûmî de qedexe ne û karê wan bi sektorên taybetî yên wekî lênihêrîna tenduristiyê di bin rêziknameyên hişk de sînorkirî ye. Ev bûye sedema valahiyek mezin a hêza kar û rêjeyên xizaniyê di nav malbatan de zêde bûne. Jin ji derketina ji malên xwe an rêwîtiya dûr û dirêj bêyî parêzvanek mêr (mahram) qedexe ne. Cihên giştî yên wekî parkan jî ji wan re qedexe ne.

Hikûmeta Talîbanê qanûnên berdewam ên wekî "fermankirina qenciyê û qedexekirina xerabiyê" derxistiye, ku rêziknameyên cil û bergan ên hişk ferz dikin û heta jinan ji axaftina li derve qedexe dikin. Talîban fermanên nû, wekî Fermana Taybet, tundûtûjî û qanûnên zordar ên navmalî bicîh kirine. Qanûna Malbatê (Fermana Hejmar 18) çarçoveyek qanûnî ya newekhev ava dike ku mafên jinan sînordar dike û ji bo wan dijwar dike ku cuda bibin, di heman demê de di vî warî de mafên mutleq dide mêran. Tevî vê zordariya sîstematîk, gelek jinên Afganî cûrbecûr şêwazên berxwedana takekesî û veşartî didomînin, wekî birêvebirina dibistanên li malê û karanîna platformên dîjîtal ji bo şopandina perwerdehiyê û xebata ji bo vegerandina mafên xwe.

### Binpêkirinên li dijî jinan

Neteweyên Yekbûyî bi raporekê piştrast kir ku berpirs û endamên Talîbanê li dijî jinên Afganî kiryarên şîdeta cinsî kirine. Mîsyona Alîkariyê ya Neteweyên Yekbûyî li Afganistanê (UNAMA) di sala 2025an de bi tevahî 21 dozên şîdeta cinsî belge kiriye, di nav de tecawizên komî, ku 15 jin û 6 keç hedef girtine.

Li gorî raporê, ev jin ji hêla berpirs û endamên Talîbanê ve rastî êrîşa cinsî an tecawizkirina komî hatine, di heman demê de hin ji wan neçar mane ku cilên xwe tazî bikin an jî bi zorê bên zewicandin. Herwiha di raporê de hat destnîşan kir ku rayedarên Talîbanê bi awayekî keyfî jinên xwepêşander girtine û dema ku di bin çavdêriyê de ne îşkence, muameleya xirab û şîdeta cinsî li wan kirine.

Di derbarê şideat li dijî jinan li girtîgehên Talîbanê de, Zarîfe Yaqubî, çalakvana mafên mirovan a Afganî, ku berê ji aliyê Talîbanê ve hatibû girtin, piştrast kir ku ew û hevkarên wê di dema girtina xwe de ji aliyê servîsa îstîxbaratê ya Talîban ve rastî gelek cureyên îşkenceyê û îtîrafên bi zorê hatine.

### Rewşa medyayê

Medyaya li Afganistanê ji dema vegera Talîbanê bo ser desthilatê ve rastî kêmbûnek tûj hatiye, zêdetirî ji sedî 40 ji dezgehên medyayê hatine girtin û bi hezaran rojnamevan karên xwe winda kirine. Rayedar di nav marjînalîzekirina berdewam a rojnamevanên jin de, sînorkirinên tund ferz dikin, di nav de qedexekirina weşandina wêneyên zindiyan, qedexekirina weşana muzîkê,û sansurkirina bernameyên siyasî.

Bi taybet jinên di sektora medyayê de dixebitin zehmetiyên mezin dibînin, Ji sedî 80 ji rojnamevanên jin dev ji kar berdane û yên ku mane bi zehmetiyên giran re rû bi rû dimînin, wek qedexekirina derketina li ser ekranê bêyî nixumandina rûyên xwe û sefera bêyî parêzvanekî mêr.

Rojnamevanên Bêsînor ji havîna 2021an vir ve girtina zêdetirî 231 dezgehên medyayê û windakirina karên zêdetirî 6,400 rojnamevanan ragihandin.Di heman demê de Rojnamevan rastî kampanyayên çavtirsandinê û girtinên keyfî tên, raporên mafên mirovan girtina berdewam a xebatkarên medyaya herêmî ji hêla karûbarên îstîxbarata Talîbanê ve û sepandina sansurek tund belge dikin.

# ‘Ciwan dînamîkên pêkanîna serkeftina entegrasyona demokratîk in’

Endama Tevgera Ciwanên Şoreşger li Rojava Dilxwaz Hemê da zanîn ku ciwan hêza dînamîk a guhertin, veguhertin û nûbûnê ne, bi îrade, perwerde û rêxistinbûnê, ew dikarin civakê ber bi azadî, demokrasî û jiyana komînal ve bibin û got, “Tevlîbûna ciwanan di pêvajoya entegrasyona demokratîk de, bingeha serkeftinê ye."

**Ronahî Sadûn**

Di demeke ku tevahî xaka Rojavayê Kurdistanê di nava pêvajoyeke nû ya entegrasyona demokratîk re derbas dibe, ev pêvajo beşdarbûn û tevlîbûneke xurt ji hemû gelên herêmê hewce dike. Di asta yekemîn de, da ku ev pêvajo bi ser bikeve û encamên wê bandorê li hemû Sûriyê bike, divê piştgiryeke mezin ji vê yekê re hebe û bi taybet rolîstina tevgerên ciwan di vê merheleyê de. Di rêveçûna xalên entegrasyonê gelek zehmetî, nerazîbûn û needaletî derdikevin holê, lê ya girîng ku ev pêvajo di dîroka xaka Sûriyê de pêvajoyekî nû ye ku tu carê nehatiye jiyankirin. Gelê Kurd di guhertina dengeyên dîrokî de bi rêya vê entegrasyonê, rolekî mezin dilîzin. Ji lewra biserxistina vê pêvajoyê bi tevlîbûna hêza ciwanên Kurd dikare hîn zêdetir bi wate bibe.

Derbarê rola ciwanan di entegrasyona demokratîk de, endama Tevgera Ciwanên Şoreşger Dilxwaz Hemê ji Rojnameya me re axivî.

**‘Ciwan hêza dînamîk a guhertin, veguhertin û nûbûnê ne’**

Dilxwaz Hemê di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser guhertina pêvajoyê û erka ku Rêber Apo da ye ser milê ciwanan û wiha got: “Ez dikarim bêjim ku ev pêvajo pêvajoyekî giran û hesas bû. Lê di heman demê de ji bo me wekî ciwan pir girîng bû, ji ber di nav kêliyekê de gelek guhertin û veguhertinên girîng çêdibûn. Herwiha piştî qonaxa duyemîn ji pêvajoya Aşîtî û Civaka Demokratîk ya ku bi navê “Entegrasyona Demokratîk” tê nasîn, di xebatê me de gelek guhertinên girîng çêbûn. Em weke ciwan ya ku hiştiye em her hêz bigrin û bi îradeya xwe, xwe ji nû ve ava bikin Rêber Apo bû, peyamên ku me ji Rêber Apo digirt hem hêz dida me, hem jî me bi hezkirinekî mezin xebatê xwe bi guhertinên girîng dewam kir.

Em ji bîr nekin ku Rêber Apo di peyama xwe de jî wiha dibêje; “Ciwan hêza dînamîk a guhertin veguhertin û nûbûnê ne, yê ku dikare ji civakê re pêşengtî bike û civakê bi rê ve bibe ciwan bi xwe ne,” ji ber vê yekê me bi destpêkirina xebatê xwe yê ji nû ve avakirin, gelek guhertinên mezin bi dest xistin. Ji xwe ya ku hişt di demeke wiha kurt de em gelek guhertinan çêkin jî Rêber Apo bû, ji ber ew her tim rêya serkeftinê nîşanî me dide. Lewra ji ber vê yekê di xebatê me yê înşayê de xala herî girîng û esasî ku li ser wê tevahî xebatê me tê meşandin “Avakirina Komînaye” em weke ciwan me hemû hêza xwe da vî xebatî, li ser vê bingehê jî em derbasî hemû gund û bajaran bûn, ji bo ku em xebatên komînan bidin meşandin, ev proje yek ji projeyên Rêber Apo ye, ji ber ku di peyama xwe de jî wiha dibêje; “Ê ku karibe pêvajoyê bi rêve bibin û bighîne asta serkeftinê ciwan bi xwe ne, ji ber vê me pir girîng dît ku em xebatekî wiha bidin destpêkirin. Di heman demê de sedem ne tenê ev yek bû, lê ji bo ku em karibin jiyaneke azad, demokratît, wekhev û komînal bi hev re jiyan bikin, ancax bi avakirina Komînan ev yek mumkin bibe, ji ber vê yekê me ve xebat û guhertin ji bo xwe pir girîng û esas dît.”

**‘Bi tevlîbûna hemû pêkhateyan, entegrasyona demokratîk pêk tê’**

Dixwaz di domdariya axaftina xwe de bal kişand ser serkestina pêvajoyê ku ew bi tevlîbûna hemû pêkhateyan e û wiha pê de çû: “ Dema ku em dibêjin entegrasyona demokratîk, ew li ser esasê ku hemû pêkhateyên li Sûriyê jiyan dikin, cihê xwe di nava vê entegrasyonê de bigrin. Em jî weke ciwan, me xwest ku hemû pêkhateyên li Sûriyê jiyan dikin cihê xwe di nava xebatê me de bigrin û rola xwe bilîzin. Li ser vê bingehê di perwerdeya me ya înşayê de, hemû çalakî û xebatê ku di çarçoveya entegrasyonê de hatin meşandin, pêkhateyên Kurd, Ereb, Ermen, Suryan û hwd… cihê xwe di nav de digrin, bi avakirina vê re entegrasyona demokratîk dikare pêk were û biserbikeve, ji ber ku her kes di nav vê entegrasyonê de rol û misyona xwe dilîze.”

**‘Divê li ser Manîfestoya Aştî û Civaka Demokratîk perwerde bên dîtin’**

Dilxwaz di dirêjahiya axaftina xwe de ev yek anî ziman: “Divê li hemû qadan perwerde werin vekirin, di rêya van perwerdeyan de em ciwan di destpêkê de Manîfestoya Aştî û Civaka demokratîk bixwînin û li ser her beşekî nîqaşên berfirh werin meşandin, ev yek jî wê bihêle ku em gelek encamên girîng bigirin, da ku di pêşerojê de jî em ciwan ji civaka xwe re bibin hêza çareseriyê. Herwiha li ser vê eseasê hemû pêkhate dikarin bi ziman û çanda xwe adet û teqalîdê xwe jiyan bikin. Ji ber ku li ser esasê jiyana komînal û azadîxwaz wê entegrasyona demokratîk bighêje wateya xwe ya herî rasteqîn.”



**‘Em bi hemû hêza xwe tevlî entegrasyonê dibin’**

Dilxwaz diyar kir ku her çiqas dewlet şaş û li gorî berjewendiyên xwe nêzî pêvajoyê dibe, lê ew bawer in bi entegrasyona demokratîk a ku Rêber Apo destpêkiriye û got: “Herî zêde em ciwan bi hatina HTŞ’ê re li ser desthilatê, di heman demê de êriş û kiryarên wan yên hovane li ser Rojava û giştî Sûriyê bandoreke pir mezin da avakirin, ji ber ku bi rêbazên xwe yên hovane xwestin ku gelê Kurd tune bikin û bê maf bihêlin. Ev yek jî sûcekî pir mezin bû, lê ne tenê gelê Kurd li Beravên Sûriyê û Siwêda jî ev komkujî li serê gelê Elewî û Durzî hatin kirin.

HTŞ’ê her çiqas bêje ku em tevî vê entegrasyonê bûne, lê bi zihniyeta xwe ya qirêj û dagirker, her hewldana binpêkirina vê entegrasyonê dike, ji ber ku ji xwe re entegrasyon bi rêbazekî pir cuda pênase dike. Lê em jî dibêjin ku em tevlî entegrasyona ku Rêber Apo behs dike bûne. Dewlet jî tu bikî nekî ev dewlet her wê zihniyeta wê dagirkirin be. Lewra baweriya me bi hêza hegemon ango sîstema desthiladar nayê, ji ber muzakerevanê vê pêvajoyê Rêber Apo ye, em jî dibêjin em ê bi hemû hêz û îradeya xwe destekê bidin entegrasyona demokratîk ya ku Rêber Apo daye destpêkirin.”

**‘Ji bo ku em destê Rêber Apo xurt bikin em xwe birêxistin û perwerde bikin’**

Endama Tevgera Ciwanên Şoreşger li Rojava Dilxwaz Hemê axaftina xwe bi dayîna vê peyamê bi dawî kir: “Peyama min ji bo hemû ciwanan ew e ku her xwe perwerde û rêxistin bikin û heya dawî xebatê xwe bidin meşandin, ji bo ku em destê Rêber Apo xurt bikin û ez dibêjim; êdî pêwîst e em Rêbetriya xwe bi awayekî azad di nava xwe de bibînin.”





## Qirkirina nerm; tunekirina şert û mercên domandina jiyanê ye

**Idrîs Henan**

Dema em têgeha Qirkirinê dibihîsin, derhal wêneyên kuştina girseyî, komkujî û şerên ku dibin sedema tunekirina komên mirovan tên bîra me. Bûyerên dîrokî yên mezin ên sedsala 20’an vê têgihaştinê xurt dikin ku êdî çi nîqaşên li ser têgeha Qirkirinê dibin, bi tunekirina fîzîkî re tên girêdan. Tevî girîngiya vê yekê, lêbelê têra vegirtina tevayiya şêweyên wêrankirina mirovan nake.

Mirov ne tenê hebûneke beolojîk e ku dijî, dizê û dimire. Lêbelê hilgêrê bîra giştî, ziman, çand, dîrok û pergala nirx û sembolên ku wateya hebûna wî ava dikin e. Di çarçoveya vê pênaseyê de girîngiya têgeha “Qirkirina Nerm – Qirkirina Çandî” derdikeve holê ku pala xwe daye ramana ku dibêje: Tunekirina gelekî ne tenê kuştina fîzîkî ye, lêbelê hilweşandina şert û mercên razber ên domandina nasnameya serbixwe ye.

Tu komeke mirovan hebûna xwe tenê ji faktorên beolojîk nagire; berevajî vê, ji toreke mezin a hêmanên razber pêk tê ku nasnameya wê ya cuda ava dikin. Ziman ne tenê amûrek veguhestinê ye, lê di heman demê de hafîzeya bîr, bawerî, zanîn û ezmûnên dîrokî ye. Dîrok jî ne tenê bûyerên borî ye, lê bingeha hişmendiya têgihaştina giştî û hestên şêdarê ye. Çand jî çarçoveya ku di hundirê wê de nerîna ji cîhanê û têgihaştina ji xwe û ji yên cihêreng re ye. Ji lew re jî, dema desthilatî zimanê gelekî hedef digire, nahêle zarok bi zimanê xwe perwerde bibin, an jî navên wan diguhere û hewl dide sembolên wî yên çandî asîmîle bike, di cewherê xwe de bingehên hebûna wê koma etnîkî û neteweyî armanc digire. Asta xeteriya wê jî bi operasyona pratîzekirina wê ya nerm re diyarker dibe.

Qirkirina fîzîkî pir beloq û eşkere ye û bala cîhanê leztir dikişîne. Lê qirkirina nerm giran e, salên dirêj dajo û bê reaksiyon e. Bi wê yekê re hewl didin têgihaştin, bîr û aidiyeta civakê asîmîle bikin ku êdî nifşên werin dûrî rehend û kokên xwe yên resen bibin. Di vê çarçoveyê de, xala guherîna demografîk, bêwatehîştina pêşengan, sixêfkirin û biçûkkirina destkeftiyan amûrên qirkirina nerm tên hesibandin. Li kêleka van hemûyan, hewldanên lawazkirina nasnameya neteweyî, parçekirina civakî û çandî û nexşeyên siyasî û çandî yên herêman ji nû ve tên xêzkirin. Li ser van bingehan nasnameya yek netewa serdest li ser pêkhateyên din tê ferzkirin ku tekane nasnameya rewa ya dewletê ye. Paralelî wê jî hemû nasnameyên din tên paşguhkirin û weke gefekî ku divê were rakirin têne hesibandin. Di encamê de civak di hundirê yek çarçoveya neteweyî de homojen û yekreng dibe.

Pirsgirêka exlaqî ne tenê binpêkirina mafê kesan e, lêbelê tadeya li ser mafê komên mirovî ya hebûn û berdewamiyê ye. Çawa ku mafê mirov ê jiyan, azadî û rûmetê heye, mafê gelan jî heye ku ziman, çand, bîr, dîrok û nasnameya xwe biparêzin. Parastina pirrengiya çandî ne kapasîtekarin û dijatiya ji kesekî re ye; berevajî wê, zengînbûneke exlaqî û şaristaniyê ye. Bi naskirina pirrengiyê re, dadmendî, wekhevî û azadî bi wate dibin.

Pirsa ku mirov bike ew e:

Zindîmayîna mirov têra parastina hebûna wî dike yan na? Mirov an gelên ku ziman, çand, bîra giştî, nasname û şiyana xwe ji dest dabin, dikarin idîa bikin ku zindî ne?

Bersivên ku werin dayîn dikarin heta radeyeke baş şêwazê fêmkirin û nihêrandina me ji têgehên edalet, azadî, mafê gelan û pirrengiya nasnameyî û çandî diyar bikin.



# Kurdan bi rêya amûrên xwe yên muzîkê çanda xwe parastine

Amûrên muzîkê yên Kurdî beşek girîng ji nasnameya gelê Kurd e, bi pîrozbahî, xemgînî û qehremaniya gelêrî ve girêdayî ne. Bi rêya muzîka xwe, Kurdan mîrateya xwe ya çandî di nav nifşan de parastiye û piştrast kiriye ku muzîk zimaneke ku dîrok, hest û nasnameya neteweyî ya kûr îfade dike.

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

Muzîka kurdî xwedî ciyawaziyeke çandî ya piralî û cihêreng e ku di nav şêweyên curbecur de cih girtiye û hertim di bi bandora xweza, dîrok û erdnîgariya Kurdistanê de maye. Muzîka Kurdî yek ji kevintirîn hunerên gelêrî yên Rojhilata Navîn e û amûrên muzîkê di parastin û veguhestina mîrata Kurdî di nav nifşan de roleke girîng lîstine. Ev amûr bi dengên xwe têne nasîn bi coş, ku xwezaya jiyana çiyayî û çanda civakî ya gelê Kurd nîşan didin.

Muzîk her tim neynikek bûye ku çand û dîroka gelan nîşan dide û gelê Kurd di nav wan kesan de ye ku bi muzîk û stranên gelêrî ve girêdayî ne. Li gundên çiyayî, di civînên civakî de û di dema pîrozbahiyên neteweyî de, amûrên muzîkê yên Kurdî wekî amûrek ji bo îfadekirina şahî, xemgînî, qehremanî û evînê hebûn. Bi saya van amûran, Kurdan karîne nasnameya xwe ya çandî biparêzin tevî dijwariyên siyasî û civakî yên ku di seranserê dîrokê de pê re rû bi rû mane. Amûrên muzîkê yên Kurdî bi cûrbecûrîya xwe têne diyar kirin, ji ber ku ew li ser amûrên bayî, têlî û lêdanê têne dabeş kirin û her amûrek xwedî taybetmendî û karanînên cûda di bûyerên gelêrî û hunerî de ye. Amûrên mûzîkê yên kurdî ev in:

**Tenbûra Kurdî**

Tenbûr yek ji navdartirîn amûrên muzîkê yên bi têl e û di nav hunermendên gelêrî de cihekî taybet digire. Ji laşekî darîn ê dirêj û stûyekî zirav bi çend têlan pêk tê û bi karanîna rîşê an tiliyan tê lêxistin. Bi dengê xwe yê kûr û xweş tê naskirin, ku ji bo stranên kevneşopî û helbestên destanî pir guncaw e. Lêkolînerên mîrata Kurdî tenbûrê ne tenê wekî amûrek muzîkê, lê wekî sembolek çandî ya bi sofîzmê û wêjeya gelêrî ve girêdayî dibînin, nemaze li herêmên Kurdistana Iraq û Îranê. Ew di pêkanîna meqamên kevnar ên Kurdî de jî tê bikar anîn, ku di lêxistinê de jêhatîbûnek bilind hewce dike.

**Sê Têl**

Amûreke muzîkê ya bi têl a Kurdî ya gelêrî y, û navê wê di Kurdî de tê wateya sê têl. Ew hinekî dişibihe tenbûr an biziqê û di muzîk û folklora Kurdî ya kevneşopî de, nemaze li deverên gundan, ji bo stran û helbestên gelêrî tê bikar anîn.





**Erbane**

Mirov dikare bêje erbane bûye parçeyek ji jiyana jinên kurd ên ku huner û dengbiyê dikin. Erbane wekî dengê jinan, remza jinan û awaza jinan xwe dide der. Bêguman ne tenê erbane, gelek amûrên muzîkê yên ku zêdetir li jinê tên û di hunera jinê ya muzîkal de xwe dide pêş hene. Erbane amûreke ku herî zêde ji hêla jinên kurd ve tê bikaranîn, bi taybetî di merasîmên olî û bûyerên çandî de. Dengbejên jin şîn û lehnên gelêrî bi giranî bi erbanê pêşkêş dikin. Ev hem wekî helwesteke hunerî û hem jî siyasî tê dîtin. Îro, jinên ku li erbaneyê didin bûne sembola berxwedanê li dijî çanda ku ji hêla mêran ve serdest e.

**Zurne**

Zurne yek ji kevintirîn û navdartirîn amûrên bayê yên Kurdî ye. Ew dişibihe bilûrê lê dengekî bilindtir û tûjtir derdixe. Ew bi gelemperî ji dar tê çêkirin û lîstikvan ji bo çêkirina lehnên xwe dispêre hêza lêdanê û tevgerên rast ên tiliyên xwe. Zurne bi berfirehî di dawet û şahiyên gelêrî de tê bikar anîn û pir caran bi tembûrê re tê da ku atmosferek zindî biafirîne. Dengê zurnê bi şiyana xwe ya kişandina balê û vejandina hestên serbilindî û coşê tê zanîn, ji ber vê yekê ew bi bûyerên giştî û şahiyên neteweyî ve girêdayî ye.

**Bilûr**

Bilûr an jî bilûra şivanan amûrê bingehîn ê muzîka gelerî ye. Boriya dengdêr ya ji darê tuyê yan yê gûzê û şahîkkirî, bilûr ne kertikkirî ye û ne jî zimanokê wê heye. Çêkirina wê bi piranî karê gundiyan e, mezinayînek wê ya sabît jî tune ye. Mirov dikare dîsa jî çend ebatên mezinahiya wê destnîşan bike: tê de carinan heft, carinan jî neh qûlên dûrahiya wan, a dawîn ne tê ku ji ya beriya xwe dûrtir e, weke hev hene. Di dawiya wê jî de qulek heye.

**Şemşal**

Şemşal amûrek kevneşopî ya gelêrî li Kurdistanê ye. Ew amûrek bayî ya dirêj e ku ji qamîş an metal tê çêkirin. Dengê wê bi dengê xwe yê bêdeng û melodîk tê xuya kirin, ku ew ji bo stranên xemgîn û kûr guncan dike. Şivanên Kurd şemşal li çiya û çêregehan ji bo şahiyê û ji bo îfadekirina hestên xwe di demên dirêj ên tenêtiyê de bi kar dianîn. Bi demê re, ev amûr bûye sembola muzîka gundewarî ya Kurdî û rêya xwe di nav berhemên hunerî yên nûjen de dîtiye.

**Defa Kurdî**

Mirov nikare bêyî ku behsa defê bike, behsa muzîka Kurdî bike, ku di piraniya pîrozbahiyên gelêrî de tê bikar anîn. Def bi mezinahiyên cûda têne û bi karanîna du çîpan têne lêxistin da ku rîtmên bihêz û cûrbecûr çêbikin. Def bi reqsên komî, dawet û pîrozbahiyên neteweyî ve girêdayî ye, ji ber ku ew tevgerên reqasvanan organîze dike û atmosferê bi enerjî û zindîtiyê tijî dike. Ew pir caran bi zurnayê (cureyek oboyekê) di duetên muzîkê yên kevneşopî de tê lêxistin ku li gundên Kurdan belav in.

**Kemançe**

Yek ji amûrên muzîkê yên kevnar û xwedî cihekî taybet e di folklore û mîrateya muzîka kurdî de. Ev amûra têlînî bi piranî ji dar tê çêkirin û bi kevaneyekê (mûyê hespê) tê lêxistin. Di muzîka Kurdî de, kûrahiya dengê kemançeyê bi awayekî berbiçav di navbera çandên herêmî de diguhere.

**Dûdûk**

Dûdûka ku carina jê re fîq jî tê gotin bi taybetî li deşt û zozanên bilind ên herêma Serhedê bi kar tê. Herwiha di muzîka hin gelên Qefqasyayê (ermenî, gurcî, azerî û hwd.) de jî tê dîtin. Dûdûk boriyeke ji guliyê dara tûyê yan mişmişê yê qeşartî ye, ku dirêjahiya wê ya normal 32 cm e. Heşt kunên ku navbera wan wekehev li ser rûyê we yê pêşî tên vekirin û li ser rûyê paşî jî qulek heye. Seriyê wê yê jorîn piçekî fireh e û tê re perçeyek qamîşa li dor 12 cm dikeviyê. Di Stranên şerî yan evîniyê yên gelerî de, ewqas ku mirov dikare bêje bi giştî bi kar tê. Herwiha, li gel defê ji bo dîlanê jî bi kar tê.

**Muzîka Kurdî: Berê û Niha**

Muzîka Kurdî beşek girîng ji nasnameya çandî ya gelê Kurd e, ji demên kevnar ve bi jiyan û pîrozbahiyên wan ên civakî û neteweyî ve girêdayî ye. Stran û muzîka Kurdî çîrokên evîn, qehremanî û xwezayê vegotine û mîrateya xwe di nav nifşan de parastine. Di demên berê de, muzîkjenên Kurd xwe dispartin hejmarek amûrên kevneşopî yên ku îro jî gelêrîn e, wek sê telî, tenbûr, def, zurne û şemşal. Ev amûr di dawetan, pîrozbahiyên gelêrî û bûyerên olî de dihatin bikar anîn, ku mirov li dora muzîkjenan dicivîn da ku ji stran û govendên gelêrî yên mîna dabkeya Kurdî kêfê bistînin. Bi derbasbûna demê re, muzîka Kurdî guhertinên girîng derbas kiriye. Amûrên nûjen ên wekî gîtar, org û keman di nav komên muzîkê de cih girtine û teknolojî û medyayê beşdarî belavbûna berfirehtir a stranên Kurdî hem di nav Kurdistanê de û hem jî li derveyî wê bûne. Hunermend niha muzîkên kevneşopî bi şêwazên muzîkê yên nûjen re tevlihev dikin da ku berhemên ku nasnameya Kurdî diparêzin û di heman demê de pêşkeftinên hunerî yên cîhanî nîşan didin biafirînin. Li gel vê pêşveçûnê, amûrên kevneşopî cihê xwe yê taybetî diparêzin, gelek hunermend û muzîkjen ji bo fêrkirina nifşên nû hatine veqetandin ka mirov çawa wan çêdike û lê dixe. Festîval û çalakiyên çandî jî têne organîzekirin da ku girîngiya mîrata muzîka Kurdî û rola wê di parastina bîra kolektîf a gelê Kurd de were destnîşan kirin.

Muzîka Kurdî wekî pirekê kar dike ku demên berê û niha bi hev ve girêdide, rastbûna mîrata xwe diparêze û di heman demê de modernîte û teknolojiyê dihewîne. Bi vê yekê, ew rola xwe ya çandî û hunerî pêk tîne, ruhê civaka Kurdî û dîroka wê ya dewlemend îfade dike. Di navbera dengên tenbûr, zurne, def û şemşalê de, muzîka Kurdî berdewam dike ku ruhê gelê Kurd, bi hemî hestên şahî, xemgînî û êşê, îfade bike.



## Ji hestê ber bi çalakiyê ve

**Remezan Olçen**

Heftiya bihurî me der barê pênase û girîngiya “hêza vegêranê” xwest ku nîşan bidin. Ev gava yekemîn bû kum e xwest em pê ya di dilê xwe de bi gewde bikin. Gava me ya duyemîn divê pirsîna wê pirsê be ku em ê vê hêza vegêranê ber bi kîjan asoyî ve bibin. Ji bo gelê Kurd, vegêran êdî ne tenê amûreke parastina ziman e; ew amûreke rûbirûbûna li dijî hişmendiya bindestiyê ye. Em di qonaxeke weha de ne ku divê em êş, hêsir û keda bêhempa ya şehîdên xwe bikin bingeha avakirina paşerojeke azad.

Di dîroka me de, bedelên hatine dayîn piranî di çarçoveya “şînê” an jî “êşê” de hatine hîskirin. Lê belê, şîna ku nebe çîrok û raman, piştî demekê civakê ber bi bêhêvîtiyê ve dibe. Li vir, erka pênûsê û hunera vegêranê dest pê dike. Erka me ev e ku em lehengiyên li ser vê axê qewimîne, ji statûya “hejmar û statîstîkan” rizgar bikin.

Gava em jiyana ciwanekî/ê ku ji bo azadiyê canê xwe daye vedibêjin, em ne tenê mirinekê, lê belê daxwaz, felsefe û xeyala wî/wê ya li ser jiyanê zindî dikin. Ev celebê vegêranê, êşê ji formeke pasîf diguherîne formeke aktîf a hişmendiyê. Xwendevan dema vê çîrokê dixwîne; dipirse, fêm dike û ji bo doza azadiyê dibe xwedî biryardarî.

Yek ji xetereyên her herî mezin a bindestiyê, “normalbûna” wê ye di hişê civakê de. Pergalên serdest her dem hewl didin ku Kurdan wekî qurbanî, wekî mirovên bêçare û bêdeng nîşan bidin. Metoda wan a vegêranê li ser lawazkirina îradeya me ye.

Pêngava me ya nû divê li ser vê bingehê be: Avakirina Antî-Vegêranê. Bi ya min du elementên antî-vegêranê hene. Yek nîşandana serketinê û îradeyê: Divê çîrokên me ne li ser çûna bin axê, lê li ser şînbûna li ser axê bin. Ya duyemîn jî rizgarkirina sînorên hişî: Her çîrokeke ku rûmeta mirovekî Kurd, biryardariya şervanekî an jî berxwedana dayikekê tîne ziman, derbeke ku li dîwarên girtîgeha psîkolojîk a bindestiyê dikeve.

Îro, nifşên nû yên Kurd di bin bandora çanda serdest a cîhanî û lehengên xeyalî yên Hollywood an jî platformên dîjîtal de mezin dibin. Zarokên me lehengên çêkirî yên çandên din nas dikin, lê ji qehremanên rastîn ên axa xwe bêpar dimînin. Ev valahî, xetereyeke mezin e ji bo domdariya doza me.

Em neçar in ku bi riya sînemayê, edebiyatê û hunerê; xwe, têkoşîna xwe, dîroka xwe, civaka xwe, şehîdên xwe û mîrasa wan a têkoşînê bikin lehengên hişmendiya nifşên nû. Ev yek nayê wateya propagandaya siyasî ya ziwa; ev tê wateya hunereke estetîk a kûr ku dilê zarokekî Kurd bi heyranî û rûmetê dagire. Gava ku keçeke Kurd an jî xortekî Kurd fêm bike ku azadiya îro bi kîjan çîrokên qehremaniyê hatiye parastin, wê demê ew ê bibe parêzvanê herî xurt ê wê pîroziyê.

Hêza vegêranê di vê qonaxê de êdî ji hewldanên şexsî derbas dibe; divê bibe stratejiyeke neteweyî. Nivîskar, hunermend, fîlmçêker û lêkolînerên Kurd divê mîna artêşeke ronakbîrî û parêzvaniya bîra civakî kar bikin. Çîroka ku neyê nivîsandin, nehatiye jiyîn; bedela ku neyê vegotin, zû an dereng tê jibîrkirin.

Ji bo ku keda mezin a şehîdan bibe bingeha rizgariya me, divê em pênûsên xwe bikin mertal û şûrên hişmendiyê. Tenê bi vî rengî, bi rûmetkirina her dilopeke xwînê ya li ser vê axê rûperekî nû yê dîrokê bi gewde dibe. Û ew rûper, rûperê azadiyê ye.

# Zêdebûna buhayê veguhestinê barekî din li ser welatiyên Sûriyê zêde kiriye

Saziya Giştî ya Veguhestina Hundirîn li Sûriyê ji sedî 20 nirxên erebeyên veguhestina hundirîn zêde kiriye. Herwiha hat zanîn ku ev yek li gorî zêdebûna lêçûnên xebitandinê, buhayên sotemeniyê û lêçûnên lênêrînê hatiye destnîşankirin. Ev jî bûye sedema zêdebûna gilî û gazinên welatî û ajokaran.

**Lîloz Hisên**

Saziya Giştî ya Veguhestina Welatiyan li Sûriyê nirxa erebeyên veguhestina hundirîn ji sedî 15 û 20 zêde kiriye, ev yek li gorî ku rêvebrê saziyê Omer Qetan diyar kiribû ku ev biryar, "Piştî lêkolînek berfireh li ser bingeha buhayên sotemeniyê, dijwarbûna rêyan û dirêjahiya wan bi kîlometreyan herwiha lêçûnên guhertin û parastina wesayîtan hat dayîn."

Ev biryar di demekê de hat ku Sûriyê bi giştî di aloziyên aborî yên zehmet de derbas dibe, herwiha bi bilindbûna lêçûn û zextên jiyanî di heman demê de dabînkirina pêwistiyên bingehîn, ku barê welatiyan giran kiriye. Buhyaên sotemeniyê û alektrîkê ji aliyekî ve hem jî buhayên veguhestina hundirîn barekî din zêde kiriye, nemaze ji bo xwendekar û xebatkaran yên ku rojane pêdiviya wan bi veguhestina bi erebeyên hundirîn hene.

### Bilindbûna buhayê bi nirxê dolar ve girêdayî ye

Rêvebrê saziyê Omer Qetan diyar kir ku buhayê veguhestinê dê li gorî guhertinên buhayên sotemeniyê "ber bi jor an jêr" ve were sererastkirin, herwiha destnîşan kir ku rêjeya zêdebûnê bi lîreya Sûrî li hember dolar ve jî girêdayî ye, ji ber ku bandora wê ya rasterast li ser buhayên parçeyên yedek û lêçûnên lênêrînê heye.

Li gorî saziyê, dê buhayeke yekgirtî ji bo hemû parêzgehan nayê pejirandin, ji ber ku komîteyeke pispor li her parêzgehê dê rêyên veguhastinê li gorî dirêjahiya rê û xwezaya rê lêkolîn bike, berî ku pêşniyaran ji parêzgar re ji bo pejirandina buhayê dawî pêşkêş bike.

Qatan destnîşan kir ku Rêveberiya Lêkolînan li Saziya Giştî ya Veguhestinê pêşniyarên tarîfeyan berî ku ji bo pejirandina fermî pêşkêşî komîteyên peywendîdar bike, amade dike.

Hêjayî gotinê ku zêdekirina nû ya buhayên veguhestinê ji bo mîkrobasan û otobûsên veguhestina hundirîn yên kompaniyên veberhênanê yên ku li parêzgehên cuda yên Sûriyê kar dikin jî, dihewîne.

### Giringiya veguhestina hundirîn bo welatiyan

Veguhestina hundirîn yek ji sektorên ku herî girîng e ji bo welatiyan herwiha bi jiyana rojane ya welatiyan bi taybet ji bo xwendekar û xebatkaran ve girêdayî ye, ji ber ku hejmareke mezin ji niştecihan ji bo tevgerên xwe di nav bajaran û di navbera taxan de, xwe dispêrin wê. Di çarçoveya kêmbûna hêza kirînê û zêdebûna lêçûnên jiyanê di salên dawî de.

Hikûmeta Sûriyê di salên dawî de çend caran buhayê veguhestina hundirîn guhertiye, ku ev yek bi guhertinên dubare yên buhayên sotemeniyê û guherînên di rêjeya lîreya Sûriyê de, hevdem bûye. Ev yek rasterast bandor li ser lêçûnên veguhastinê û xizmetên girêdayî wê kiriye.

### Gilî û gazin li ser şert û mercên jiyanê zêde dibin

Li gorî malperên medyayî, yek ji çavdêriyên xetê diyar kir ku zêdebûna buhayê veguhestina hundirîn ji ber zêdebûna buhayên mazotê, parçeyên yedek û zeytên erebeyan pêk hatiye herwiha destnîşan kir ku buhayê vehuestina hundirîn li hin xetan ji 4 hezar lîreyên Sûriyê zêde bûye û gihîştiye 5 hezar lîreyan, lê li hin xetên din gihîştiye 6 hezar lîreyan.

Çend welatiyan jî nerazîbûna xwe li hember biryarê nîşan dan û tekez kirin ku zêdebûna buhayê barê wan ê darayî zêde dike. Xwendekarekî di dibistina amadehî de ku rojane ji "Jdeidet el-Fadl" diçe Şamê got ku lêçûnên wî yên veguhestinê ji nêzîkî 10 hezar lîreyên Sûrî heya 12 hezaran zêde bûne, di heman demê de destnîşan kir ku buhayê veguhestinê di navbera hin ajokaran de cuda ye.



### Buhayên pêwistiyan bilind dibe û mûçe sabît in

Di heman demê de welatiyan ji ber mûçeyên ku wekî berê mane li hemberî bilindbûna berdewam di buhayan de êşa xwe anî ziman. Welatiyek dibêje ku lêçûna veguhestina wî ya rojane dighêje 22 hezar lîreyên Sûrî, tekez kir ku bilindkirina buhayê veguhestina hundirîn bêyî zêdekirina mûçeyan zextên aborî li ser malbatan zêde dike.

Ji aliyekî din ve, hejmarek ji ajokaran piştrast kirin ku zêdebûna dawî başbûnek berbiçav di dahata wan de bi xwe re neaniye, ji ber zêdebûna berbiçav a lêçûnên xebitandin û lênêrînê.

Yek ji ajokaran destnîşan kir ku piraniya dahata rojane ji bo kirîna sotemeniyê tê xerckirin, lê qezenca mayî têrê nake ku lêçûnên jiyanê an lênêrîna rûtîn a wesayîtan bide. Hin welatiyên ku diçin û tên dibînin ku barên wan ên aborî ji ber zêdebûna berdewam a lêçûnên veguhastinê û buhayên pêdiviyên bingehîn girantir dibin. Welatiyekî diyar kir ku lêçûnên wî yên rojane yên çûnûhatinê dibe ku bigihîjin 100 hezar lîreyên Sûrî û hişyarî da ku ger ev rewş wiha berdewam bike, ev dikare bandorê li ser şiyana gelek kesan di domandina karên xwe an jî pabendîbûna bi dewama fermî, bike.

# Bazara goşt û sebezeyan li Tirbespiyê... 80'ê sal ji bîrdank û bazirganiyê

**Jîn Hisên/Tirbespiyê**

**Bazara kevin a li Tirbespiyê yek ji kevintirîn bazarên gelêrî yên bajêr e, berê ew navendek ji bo firotina sebze, fêkî û goşt bû. Îro ew şahidê bîranîna bajêr û jiyana kevin a şêniyên wê dimîne.**

Di naveresta bajarokê Terbespiyê, bazara kevin ya "Sebze û Goşt" tevî guhertinên mezin ên ku di deh salên dawî de lê çêbûne, hîn jî wekî şahîdek bo serdemeke dirêj a dîroka aborî ya bajêr radiweste. Ev cih, ku berê bi tevgera rojane ya şêniyan û firoşkaran tijî bû. Ji ber bandorên aborî yên çêdibin û bilindbûna buhayan û nirîx dolarê, îro ev bazar bê deng maye, di heman demê de xwediyên firoşgehên kevin hewl didin ku tiştê ku ji giyan û bîra bazarê maye, biparêzin.



### Bazar navenda sereke ya firotina sebze û goşt bû

Di demên borî de ev bazar navenda sereke ya firotina sebze, fêkî û goşt bû. Şêniyên bajêr rojane berê xwe didan bazarê da ku van pêdiviyan peyda bikin. Lê îro di hundirê vê bazarê de pêdiviyên malê, xwarin û cûrbecûr pêdiviyên rojane tên firotin û peyda kirin, tenê yek firoşgeha sebze û fêkiyan maye, dîmenek ku asta veguherîna di bazarê de derbas bûye, nîşan dide.

Li gorî vegotinên firoşkarên bazarê, bazara Sebze û Goşt berî salên 1980'ê ji aliyê Şemûn Moro û Ezîz Zorava ve hatiye ava kirin. Di destpêka wê de tenê ji du beşan pêk dihat, banê wê vekirî bû û dema ku hate avakirin nêzîkî deh dikan tê de hebûn.

Firoşgehên li kêleka bazara pîşesaziyê herwiha qeyseriya Goşt û Sebzeyan ya berê û niha ji hêla Şemûn Moro ve hatine avakirin, herwiha beşa başûr a mayî ya bazarê, digel bazara mirîşkan a navdar ji hêla malbata Zorava hatiye avakirin.

Tevî guhertinên aborî û kêmbûna çalakî û tevgerên bazirganiyê, bazara kevin hîn jî cihê xwe di bîra şêniyên bajêr de diparêze, ne tenê wekî cihekî kirîn û firotinê, lê di heman demê de wekî beşek ji dîroka civakî ya Tirbespiyê û wekî cihek ku çîrokên mirovan û taybetmendiyên jiyana kevin ên ku hîn bi tevahî winda nebûne tîne cem hev.

### Guhertinên aborî bandor li tevgera bazarê kiriye

Fîras Xelîl Remo welatiyeke ji Tirbespiyê ye û yek ji xwediyê firşogekê di nava bazarê de ye, ji me re diyar kir ku di bazarê de derdora 40 firoşgehên curbicur hene, tê de hemû pêdiviyên jiyanî yên bingehîn tên peydakirin û wiha anî ziman: "Gelek firoşgehên kevin di bazarê de hîn jî mane, derdora 40 firoşgeh in, tenê yek firoşgeh ya sebzeyan û fêkiyan maye. Tevgera bazarê di salên dawî de bi awayekî berbiçav kêm bûye, bi taybetî bi guherîna nirxa dolar û bilindbûna bihayan, ku rasterast bandor li kirîn û firotinê kiriye. Di destpêka sala nû de tevgera çûn û hatinê pir kêm bibû, lê niha ji ber nêzîkbûna cejna Qurbanê tevgera şêniyan baş bûye."



# Sûriyê di gelek çerxan re derbas bûye, îro hewcedarî çerxa demokratîkbûnê ye

Dîroka Sûriyê dîrokeke gelek dirêj û dewlemend e. Ji şaristaniyên kevnar heta împaratoriyên mezin, ji serdema Îslamî heta serdema nûjen, Sûriyê her dem roleke girîng di dîroka Rojhilata Navîn de lîstiye. Lê Sûriyê di gelek çerxan re derbas bûye, îro hewcedarî çerxa demokratîkbûnê ye.

**Ronaz Silêman**

Dîroka Sûriyê bi hezaran salan vedigere û dewlemendiya wê ya çandî û dîrokî gelek mezin e. Her çend welat di salên dawiyê de pirsgirêkên mezin jiyaye, Sûriyê hîn jî yek ji navendên girîng ên dîrok û şaristaniya mirovahiyê tê hesibandin.

### Sûriyê

Sûriyê yek ji welatên herî kevin ên Rojhilata Navîn û cîhanê ye. Li ser axa Sûriyê gelek şaristanî, dewlet û împaratorî hatine damezrandin. Ji ber cihê xwe yê girîng di navbera Asya, Afrîqiya û Ewropayê de, Sûriyê her dem navendek bazirganî, çandî û siyasî bûye. Dîroka Sûriyê bi hezaran salan vedigere û di nav xwe de gelek demên girîng hildigire.

### Sûriyê di demên kevnar de

Nîşaneyên yekem ên jiyana mirovan li Sûriyê ji hezaran sal B.Z têne dîtin. Di Sûriyê de bajarên kevinar wekî Êbla, Mari û Ugarit pêş ketin. Êbla di hezar sala sêyem B.Z de yek ji dewletên herî bihêz bû. Li wir bi hezaran tabletên axê hatin dîtin ku agahiyên girîng li ser aborî, siyaset û jiyana rojane bû. Ugarit jî bi alfabeya xwe ya taybet navdar bû ku yek ji destpêkên nivîsandinê tê hesibandin. Herwiha gelek dîrokzan vê alfabeyê wekî yek ji bingehên alfabeyên nûjen dibînin.

### Serdema Asûrî, Babilî û Farisî

Di navbera sedsalên 9 û 6'an B.Z de, Sûriyê ket bin desthilata gelek împaratoriyan. Di destpêkê de, Împeratoriya Neo-Asûrî herêm kontrol dikir. Piştre Împeratoriya Neo-Babilî û paşê Împeratoriya Hekamenîş hatin ser desthilatê. Di vê serdemê de Sûriyê navendek bazirganî ya girîng bû û rêyên bazirganî yên mezin di navbera şaristaniyan de ji vir derbas dibûn.

### Serdema Yewnanî

Di sala 333 B.Z de, Îskenderê Mezin Sûriyê dagir kir. Piştî mirina wî, herêm ket bin desthilatdariya Selçûqiyan. Çanda Yewnanî li seranserê herêmê belav bû û gelek bajarên nû hatin damezrandin. Di vê serdemê de zanist, huner û felsefe pêş ketin. Têkiliya navbera çandên Rojhilatî û Yewnanî jî zêde bû.

### Serdema Romayî

Di sedsala yekem a B.Z de, Sûrî bû beşek ji Împeratoriya Romayê. Bajarên wekî Şam, Heleb û Palmîra (Tetmûr) geş bûn. Palmîra bû navendeke bazirganiya navneteweyî. Li wir, Zenobiya dewletek bihêz ava kir û li dijî Romaniyan şer kir.

### Serdema Bîzantî

Piştî dabeşbûna Împeratoriya Romayê, Sûriyê ket bin desthilatdariya Împeratoriya Bîzantî. Di vê serdemê de, Xiristiyanî li herêmê bi berfirehî belav bû û gelek dêr û navendên olî hatin avakirin. Şam û Heleb bajarên girîng man.

### Serdema Îslamî

Di sala 636'an PZ de, artêşa Misilmanan di Şerê Yermûkê de bi ser ket û Sûriyê ket bin desthilatdariya Îslamê. Di sala 661'an de, Xîlafeta Emewiyan hate damezrandin û Şam bû paytexta wê. Di vê serdemê de, hinekî zanist pêş ket, bazirganî geş bû û avahiyên mezin hatin çêkirin. Çanda erebî belav bû. Piştî Emewiyan, Abbasiyan desthilat girtin û paytext ji Şamê bo Bexdayê veguhastin. Di serdema Selçûqî û Xaçperestan di sedsalên navîn de gelek şer li ser Sûriyê çêbûn. Leşkerên Xaçperest gelek herêm dagir kirin. Nûreddîn û paşê jî Selahedîn, di vê serdemê de di nav kesayetiyên herî berbiçav de bûn. Selahedîn bi serketinên xwe yên li ser xaçperestan û vegerandina beşên mezin ên Sûriye û Filistînê navdar bû.

### Serdema Memlûkî

Di sedsala 13'an de Memlûkan desthilat girt. Wan gelek êrişên Mogolan rawestand. Di vê demê de bazirganî, çand û zanist dîsa pêş ketin û gelek avahî hatin çêkirin.

### Serdema Osmanî

Di sala 1516'an de, Sûriyê ket bin desthilatdariya Osmaniyan. Ev desthilat nêzîkî 400 sal dom kir. Di vê serdemê de, Şam navendeke girîng, xaleke destpêkê ji bo karwanên hecê û navendeke bazirganiyê bû. Lê belê pirsgirêkên siyasî dijwartir dibûn.

### Mandaya Fransî

Piştî Şerê Cîhanê yê Yekem, Împeratoriya Osmanî hilweşiya. Di sala 1920'an de, Fransayê kontrola Sûriyê girt destê xwe. Gelê Sûriyê li dijî vê desthilatdariyê serî hilda. Serhildana Mezin a Sûriyê yek ji navdartirîn serhildanan bû.

### Serxwebûna Sûriyê

Di sala 1946'an de, hêzên Fransî ji Sûriyê vekişiyan û welat serxwebûna xwe bi dest xist. Lê belê, piştî serxwebûnê, gelek caran derbeyên leşkerî çêbûn û gelek caran hikumet guherî.

### Yekbûna bi Misrê re

Di sala 1958'an de, Sûriyê û Misir bûn yek û dewletek bi navê Komara Erebî ya Yekbûyî ava kirin. Lê ev yekîtî tenê 3 salan dom kir û di sala 1961'an de bi dawî bû.

### Serdema partî yan jî rêjîma Baasê

Di sedsala 20'an de gelek guhertinên siyasî, derbeyên û pevçûnên navxweyî çêbûn. Di sala 1963'an de, Partiya Baas a Sosyalîst a Ereb desthilatdarî girt ser xwe. Partiya Baas siyaseta neteweperweriya erebî pêş xist. Di sala 1970'î de, Hafiz Eseed bi darbeyekê leşkerî desthilatdarî bi dest xist. Wî hêza dewletê zêde kir, leşker bihêz kir, kontrola siyasî gelek xurt kir. Hafiz Eseed heta sala 2000'an serokatiya welat kir. Piştî mirina Hafiz, kurê wî Beşar El-Eseed bû serok. Di destpêka hatina Beşar El-Eseed de, gelek kes hêvîdar bûn ku reforman bike, lê pirsgirêkên siyasî berdewam kirin.

### Sûriyê di nava berjewendiyên siyasî de tê teşekirin

Di van serdeman de, bi taybetî di dema rêjîma Baasê de, Sûriyê di gelek kirîz û êşan re derbas bû. Gelên Sûriyê rastî hemû cûreyên siyasî yên tund hatin. Lê pirs ev e ku gelo serdemek ji van serdeman nikarîbûn xwe li ser lingan bigre û Sûriyê ava bike? Mixabin dema mirov lêvgereke dîrokî dike, dibîne, çareserî qet ji bo Sûriyê nehatiye kirin, bi taybet weke tê zanîn; Sûriyê di hemû aliyan de cihêrengiyê vedihewîne, aliyê xwezayî yan jî mirovî be. Ji ber gelek pêkhate, ol û netewên cuda cuda li ser axa Sûriyê bi hezarên salan jiyan kirine heya roja îro jî li Sûriyê ne, lê ew di nava Sûriyê de mafekî mirovî bidest nexistine, ji ber cihêrengiya Sûriyê tê nixmandin û di nava berjewendiyên siyasî de tê teşekirin. Lewra ji ber ku ev êşa salan di dilê Sûriyan de hatibû komkirin, wan dest bi "Şoreşa Sûriyê" kirin. Lê mixabin şoreş ji dêvla ku bi ser biketa ew veguherî kirîzê, ev kirîz jî heya roja îro berdewam dike… Şerê Sûriyê ne tenê şerekî navxweyî bû, gelek welat, di nav wan de Rûsya, Îran, Tirkiyê û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, bi awayên cûda tê de beşdar bûn. Ev têkiliyên derve bûn sedema dirêjkirina şer û zêdebûna aloziya wê.



Li kêleka Şoreşa Sûriyê "Şoreşa Rojava" bi pêşengiya gelê Kurd hat destpêkirin. Şoreşa Rojava jî li ser bingeha birêxistinkirina gel, bidawîbûna siyaseta paşguhkirin, naskirina mafê jin, pêkanîna jiyana wekhev, demokrasiyê û hwd…ne.

### Ketina Rejîmê û qonaxa nû ya Sûriyê

Piştî ku girîngî û rola mala Eseed li cem desthilatdarên herêmî û navneteweyî hate bidawîkirin, bi planên veşartî bi rêya hikumeta demkî ya niha li Sûriyê rêjîma Baasê hilweşandin. Di vir de kî hat HTŞ'ê hat û şûna mala Eseed girt, ji destpêkê û heya niha jî gelên Sûriyê metirsiyên wan ji vê hikumetê hebû û heye, ji ber ew dizanin dîrok çi li ser rastiya wan nivîsandiye, tenê alîgirên vê hikumetê herî zêde baweriyê bi wê tînin. Dîsa jî tevî her tiştî Sûriyê û gelên wê rûpeleke nû vekirine, hêvî ji destpêka hatina vê hikumetê û heta niha dikin ku rewşa heyî gurtinên baş bînin. Lê niha rewşa avakirina Sûriyê ne zelal e, ji ber hîna paşguhkirin û siyaseta berê tê meşandin. Em a bi hezarên salan e êş tê kişandin û çareserî pêk nehatiye. Di heman demê de Sûriyê di gelek çerxan re derbas bûye, îro hewcedarî çerxa demokratîkbûnê ye.

### Rewşa siyasî, civakî, aborî, rêxistinî, perwerde û hwd… li Sûriyê

Dîroka siyasî ya Sûriyê tije guherîn, nakokî û têkoşîn e. Ji serxwebûnê heta şerê navxweyî û rewşa niha, welat di nav şert û mercên dijwar de maye. Pêşeroja Sûriyê bi asta mezin girêdayî ye bi çareseriya siyasî, avakirina aborî û peydakirina aramiya domdar ji bo hemû welatiyan.

Rewşa civakî ya Sûriyê di deh salên dawî de bi taybetî ji ber şerê navxweyî yê ku di sala 2011'an de dest pê kir, gelek guheriye. Civaka Sûriyê ji komên etnîkî, olî û çandî yên cihêreng pêk tê û ev cihêrengî di dîrokê de beşek girîng a civaka welêt bûye. Lê ji ber xizaniyê rewşa civakê xirab bûye.

Xwendin û perwerde li Sûriyê ji ber siyasetên dewletê gelek astengî kişandiye, naskirina bi mafê perwerdeyê yê hemû pêkhateyên wê nehate kirin, heya roja îro jî ev yek pêk tê. Ji ber vê rewşê û ji ber bûyerên li Sûriyê rû dan, gelek dibistan û zanîngeh hatin hilweşandin û gelek zarok ji perwerdehiyê dûr ketin û hîn jî gelek malbat di warê gihîştina perwerdehiyê de zehmetiyan dibînin.

Aboriya Sûriyê yek ji sektorên ku herî zêde ji şerê navxweyî bandor bûye; Şertên jiyanê gelek xera bûne. Bihayên tiştan bilind bûne, bêkarî zêde bûye û gelek malbat di xizaniyê de dijîn. Kêmbûna kar, elektrîk, av û xizmetên bingehîn jiyana rojane ya gel dijwar kiriye.

Digel hemû dijwariyan, heke şertên siyasî û ewlehiyê baştir bibin, derfet heye ku welat bi gav bi gav aboriya xwe ji nûve ava bike û şertên jiyanê yên gel baştir bibin.

### Divê dewlemendbûna Sûriyê bi çareseriyeke mayendî bê parastin

Di encamê de em dikarin vê yekê bînin ser ziman ku îro Sûriyê hîn jî bi gelek pirsgirêkan re rû bi rû ye, aborî lawaz e, gelek kes koçber in, gelek herêm zirar dîtine, avakirinên nû hewce ne. Lê her çend pirsgirêk hebin jî, Sûriyê hîn jî dewlemendiya xwe ya dîrokî û çandî diparêze.

# Şerê stratejiyan li ser Rojhilata Navîn û Kurdistanê

Zinar Yildiz



Piştî erkdarkirina Tom Barrack weke nûnerê Serokatiya Amerîka ya Surî û Iraqê li Rojhilata Navîn nîqaşên berfireh li ser stratejiya Amerîka ya li Rojhilata Navîn tê meşandin.

Gelo Amerîka bi erkdarkirina Tom Barrack ve çi peyamê dide gelên Rojhilata Navîn?

Ji vê jî girîngtir, stratejîya Amerîkayê li Rojhilata Navîn çi ye?

Ji salên 2004 û şûnde di hin saziyên hizrandinê weke İnstîtûya Polîtîkayên Rojhilata Nêz a Amerîkayê de li ser stratejîya Amerîkayê ya li Rojhilata Navîn hin rapor hatin amadekirin. Di wan raporan de stratejiya bi navê 'Three Pillars' yanî 'Sê Stûn' weke stratejiya sereke ya Amerîkayê li herêmê dihat nasîn.

**Ev stratejî çi ye?**

Ev stratejî li ser sê lingan an jî stûnan tê avakirin. Stûna yekemîn Security-Ewlekarî, stûna duyemîn Reform-Ji nû ve Têşedayîn, stûna sêyemîn jî Peace-Aşitî ye.

Li gorî wan stûnan Amerîka li Rojhilata Navîn di serê de mijara ewlekariyê dike mijara sereke ya pêwendiyên xwe. Hebûna xwe li herêmê li ser ewlekariyê ava dike. Hebûna hin hêzên bi navê ''terorê'' dibe hinceta sereke ya ewlekariyê. Li gorî Amerîka di nava wan hêzên terorîst de Îran, El-Kaîde û hêzên berdewam û şopdarê wan hene. Dîsa xeteriyên li ser rê û herêmên tîcaret û enerjiyê dibe pêdiviyeke ewlekariyê. Ji ber ku gelek hêzên cihanî li ser çavkaniyên enerjiya herêmê û rêyên tîcaretê hesabên cuda dikin û ew yek li gorî berjewendiya Amerîka xeteriyeke mezin ava dike. Di mijara ewlekariyê de mijareke din a sereke jî ewlekariya Îsraîlê ye. Erîş û xeteriyên erîşan li ser Îsraîlê ji bo Amerîka dibe mijara ewlekariyê ya li Rojhilata Navîn.

Li hember wan xeteriyên ewlekariyê, DYA li hêrêmê di serê de gavên ewlekariyê Li Rojhilata Navîn diavêje.:

- Baregehên leşkerî ava dike.
- Hevpeymaniyên leşkerî îmze dike.
- Çekan li herêmê belav dike û difroşe.
- Torên îstixbaratî çêdike.

Stûna duyemîn a vê stratejiyê Reform yanî ji nû ve têşedayîn e. Li gorî xeteriyan, DYA li herêmê pêwendiyên stratejîk û taktîkî ava dike. Di nava wan pêwendiyan de dixwaze hemu hêzên bi Amerîkayê ve di danûstandinê de ye biguherîne û li gorî berjewendiyên xwe têşe bide. Ew hêz dibe dewletek be yan jî rêxistinek be. Amerîka dixwaze di nava wan hêzan de kes an jî rejîmên li gorî xwe ava bike û bi cih bike. Ger ew hêz li gor Amerîkayê nemeşe di dawiyê de pişta xwe dide wan hêzan. An bi xwe derbekê lêdixe an jî dihêle ku ji aliyê alîgirên din a Amerîkayê ve were têkbirin. Gavên ji bo reformê ji aliyê Amerîkayê ve tê avêtin ev in:

- Projeyên destwerdana rejîman
- Zêdekirina tevgerên Saziyên Sîvîl a Alîkariyan (Munazama)
- Pêşxistina Projeyên Medya-Ragihandinê
- Pêşxistina projeyên perwerdekirinê di nava pîşeyên cuda de

Stûna sêyemîn a stratejiyê Peace-Aşitî ye. Ev stûn di hin cihan de weke entegrasyona herêmî jî tê binavkirin. Di vê stûnê de armanc ewe ku aliyên ku bi stûna askerî hatiye kontrol kirin û bi reforman hatiye guhertin bigihînin hev û li gor berjewendiyên xwe pergaleke ava bikin. Di vê mijarê de armanca sereke ya Amerîkayê lihevanîna Îsraîl û welatên Ereban bû. Û di roja me ya îro de bi hevpemana Îbrahîmî ve heta astekî ev yek hatiye pêkanîn. Di mijara pirsgirêka Fîlîstînê de jî heta niha stûna yekemîn weke kontrolkirina leşkerî berdewam e. Ger hêzên weke Hizbûllah û Hamas di encama şerekî dijwar de li gorî berjewendiyên Amerîka têşe bigire dikarin bi Îsraîlê ve dest bi pêvajoya aşitî yanî entegrasyonê bibin. Ger nekevin nava reformê wê demê di konaxa yekem de bi awayekî leşkerî ji holê werin rakirin. Heman tişt ji bo Îranê jî derbasdar e. Lê ji ber ku Îran xaleke sereke ya Rojhilata Navîn e û di asta leşkerî de nê lewaz e Amerîka dixwaze li Îranê bi pêvajoya reformê ve bigihîne pêvajoya aşitî yan jî entegrasyonê.

Lê li gorî tê fêmkirin di çend salên dawî de di stratejiya Three Pillars-Sê Stûn de hin guhertin pêk hatiye. Berê sala 2020'an, Amerîka di gotin de ji bo pêvajoya reformê gotina Demokrasiyê gelek bikardianî. Yanî di gotin de jî be her tim di bin navê mafê mirovan, adalet û wekheviyê de digot ''emê demokrasiyê bînin Rojhilata Navîn''. Lê ji 2020'an şûnde edî ji gotina Demokrasiyê jî dûrket. Ji bo guhertina rejîman û avakirina rejîmên nû pergalên otokratîk esas girt. Ji hêzên demokratîk zêdetir hêzên tundrew, yek kesî û cîhadîst ji bo xwe kir bingeh. Efxanîstanê ji Talîban re hişt. Li Surî HTŞ ji bo Şamê amade kir, niha li Îranê dixwaze bi hin guhertinên şiklî ve bi rejîma molla ya Îran ê ve li hev bike. Pêwendiyên xwe bi Qatar û Sûdî Erebistanê re pêşxist. Û di vê çarçoveyê de xwest bi pêşxistina rejîmîn otokratîk ve hemu erdnîgariya Rojhilata Navîn derbasê pêvajoya entegrasyonê bike.

Niha Tom Barrack nûnertiya vê stratejiyê dike. Ji xwe Barrack ev yek di pêvajoya derbasbûyî de gelek aşkere anîbû ziman. Li gorî têgihîştina Amerîka û nûnerê wî ya bi navê Barrack li Rojhilata Navîn demokrasî ne guncav e û nayê pêkanîn. Li gorî wan, civaka Rojhilata Navîn encax bi rejîmên otokratîk dikarin werin bi rêvebirin. Lewma berê xwe dan rejîmên navendî û desthilatdariyên hişk.

Ji nû ve erkdarkirina Barrack weke nûnerê Irak û Surî tê vê wateyê ku hem li Irakê hem jî li Surî pêvajoya Reformê ji aliyê avakirina rejîmên navendî û otokratîk hin xurt û leztir bimeşe. Ev yek yekser li ser Kurdan bandorê bike.

Kurdan heta niha li Iraqê weke fermî di pergaleke federasyonê de hebûna xwe berdewam dikin. Ev yek destkeftiyeke statûya Kurdan e. Lê ger guhertina rejîma Iraqê were rojevê wê demê li ser statûya Herêma Federal a Kurdistanê bikeve xeteriyê de. Dîsa li Surî û Rojava piştî şerekî dijwar bi lihevkirina 29ê Çileyê ve di navbera Rêveberiya Xweser û hikumeta Şamê ve pêvajoyeke entegrasyonê hatibû destpêkirin. Lê ev pêvajo weke tê xwestin nameşe û entegrasyon pêk nayê. Niha ger Barrack di rejîmên navendî de israr bike, dibe ku hikûmeta Şamê pêvajoya entegrasyonê bi Rêveberiya Xweser ve bide sekinandin û ev yek jî pêşî li şerekî nû veke.

Li Tirkiyê û Bakûrê Kurdistanê jî pêvajoyeke Aşitî û Civaka Demokratîk ji aliyê Rêber Apo ve hatiye destpêkirin. Ji ber ku mejiyê bingehên ya dewletê, xeteriyên li ser xwe dibînin û dixwazin ev pêvajo bê qeza û bela bimeşe. Lê di demên dawî de daxuyaniyên Hakan Fîdan û Tom Barrack di heman çarçoveyê de gumanan di serê herkesî de çêdike. Gelo dewleta Tirk çiqas dikare li hember projeya Amerîkayê di projeya aşitî û civaka demokratîk de bi israr be. Ger ev israr bişkê xeteriyê şerekî mezin li ser Tirkîye li ber derî ye.

Di encam de di destpêka sedsala bîstûyekemîn de li pêşiya Kurdan gelek derfetên mezin derket. Li gorî wan derfetan jî gelê Kurd hin destkeftiyan bi dest xistin. Niha Amerîka û Îsraîl dixwazin li herêmê di çarçoveya projeyên xwe de destkeftiyên kurdan bixe bin xeteriyeke mezin. Ji ber ku Kurd li her çar parçeyên Kurdistanê jî doza adalet, wekhevî û demokrasiyê dike. Ji bo parastina destkeftiyên Kurdan jî pêwîstiya stratejiyeke sê stûn heye. Stûna yekemîn Parastina Hebûna Xwe, stûna duyemîn Avakirina Pergaleke Demokratîk, stûna sêyemîn jî Yekîtiya Kurdan e.

# Bûye dosyeke jibîrkirî!

Reşo Mihemed

Mijar DAIŞ e, DAIŞ kî ye û kî xeteriya wê nas nake, xeteriya wê li ser aramiya cîhanî? Aramiya herêma Rojhilata Navîn, herêma ku sedsala bûrî û heyî bûye navend ji DAIŞ'ê re, bi taybet li Îraq û Sûriyê. Di çarçoveya şer û tevlîheviya ku Rojhilata Navînê tê re derbas dibe tirsa zindîbûna çeteyên DAIŞ'ê derdikeve holê. Ji ber valahiyên ewlehiyê û alozîyên siyasî yên ku cîhan rastî wê tê, DAIŞ sûd werdigirin da ku xwe dîsa bi rêxistin bikin. Li hemû welatan ne bi heman astê ye, her welatekî ku DAIŞ'ê lê heye, li gorî şert û mercên wê herêmê tevdigerin. Li Îraq û Sûriyê, navenda damezrandina DAIŞ'ê, devera herî xeternak di Rojhilata Navîn de dosya DAIŞ'ê hatiye jibîrkirin. Di dema heyî de piştî geşedanên di ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê re derbas bûn, evqas berxwedaniya QSD li hemberî DAIŞ'ê, DAIŞ mîna ava kaniyeke hêdî hêdî diherike, aveke hêdî hêdî ye, xeteriyeke mezin heye ku bibe çemekî bi xumexum û herêmê bi tevahî li ber lehiya xwe bibe. Mîna çemê Furatê ku çawa dewleta Tirk bendav vekir û hişt Dêrazorê û Reqayê li ber here, dewleta Tirk niha xwedî serweriyeke mezintir e li Sûriyê, bi dehan endamên MÎTA dewleta Tirk li seranserî Sûriyê û bi taybet li deverên weke Dêrazorê û sînorê Îraq û Sûriyê tevdigerin. Êdî MÎTA Tirkiyê bi hêsanî xwe digihîne çeteyên DAIŞ'ê. Ji ber vê sedemê dosya DAIŞ'ê bi awayekî rasterast ketiye destê hikumeta Sûriyê ya demkî bin sîwana dewleta Tirk, ev dosye bi hevkarî tê birêvebirin, ev yek jî dibe cihê metirsiyek mezin. Bi destpêkirina kirîza Sûriyê û Şoreşa Rojava re Qaîde, Cebhet Elnusra û paşê çeteyên DAIŞ'ê zêdeyî nîvî ji axa Sûriyê û Rojava xistin bin kontrola xwe, bi berxwedaniya YPG û YPJ a ku ji Dêrkê, Tirbespî, Qamişlo, Tilhemîs dest pê kir heya Hesekê, Girê Spî, Serêkaniyê, Reqe, Kobanê, Dêrazorê, Efrîn û gelek gund û navçeyên din berdewam kir, DAIŞ hat têkbirin. Bi demdirêjiya 10 salan bi hezaran çeteyên DAIŞ'ê di hundirê girtîgihan de bû. Kilîda ewlehî û xeteriyê di destê QSD'ê de bû. DAIŞ weke bombeyekê bû QSD'ê parastina wê dikir da ku hêzên wekî dagirkeriya Tirk pê nelîze û neteqîne, ji ber ku eger ev bombe teqiya wê Sûriyê, herêmê û tevahiya cîhanê li ber xwe bibe. Di van dema dawîn de, bi pêşketinên leşkerî yên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, pirsgirêkek derket holê, encamên wê ne tenê bi erdnîgariyeke taybet re sînordar bû, lê bandora wê li tevahiya axa Sûriyê ye. Lê tişta balkêş nebûna helwesta Hevpeymana Navdewletî li hemberî DAIŞ'ê ye, cîhanê dixine rewşeke wiha de ku DAIŞ'ê têkçûye, xeteriya wê nemaye. Lê rastî ev e, hêzên navdewletî çavên xwe ji vê dosyayê digirin, sedema sereke ne şerê ku li herêmê rû dide ye, ne şerê DYA-Israîl li ser Îranê ye, sedema sereke ew e ku girîngî nayê dayîn bo dosya DAIŞ'ê, ev yek jî dikeve bin siya berjewendiyên hêznê weke Amerîka, Israîl, Birîtanya û hwd…

Xeteriya DAIŞ'ê di roja îro de ji hemû serdemên bûrî dijwartir e, lê pirsa cewherî ew e gelo DAIŞ çima li Sûriyê û Îraqê maye û çima nehatiye tunekirin tevî şiyana Hevpeyamana Navdewletî heye ku wê têkbibe, bersiv jî di nabera du kevanekan de ew e (DAIŞ jî beşek ji planên Rojhilata Navîn e, plana hêzên hegemon e û her serdemekê ereke DAIŞ'ê heye, di heman demê de ew ê li gorî berjewendiyên van hêzan were dadgehkirin, tunekirin û an jî vejandin)



# Li dijî gelê Elewî: Siyasetên dijatî û baykotkirinê

**Bi armanca pêşxistina xîtaba kîn û nefretê, parçakirina civaka Sûriyê û kûrkirina kirîzan, kampanyaya bi navê 'Ez ne dar im' ku bangên dijatî û baykotên aborî û civakê li dijî gelê Elewî li Sûriyê dihewîne, di 31'ê Gulanê de ji aliyê hin alîgir û kesên ser bi hikumeta demkî ya Sûriyê ve, li ser torên medayaya civakî hatiye destpêkirin.**


Aryan Hesen

Di 31'ê Gulanê de li dijî gelê Elewî li Sûriyeyê kampanyayeke baykotkirinê hate destpêkirin. Di kampanyayê banga baykotkirina civakî, aborî û tehrîdê tê kirin.

Gotinên nefretê û bangên cudakar li dijî civakên Elewî û Durziyên li Sûriyeyê di demên dawî de zêde bûne. Bi kampanyayeke nû ya hashtagê ku di 31ê Gulanê de hat destpêkirin, daxwaza qutkirina têkiliyên bazirganî û civakî bi welatiyên Elewî re hat kirin. Kesên di nava kampanyayê de cih digirin xwe wekî alîgirê hikumeta demkî a Sûriyê bi nav dikin.

Di parvekirinan de daxuyaniyên cudakar ên wekî rêgirtina li zarokan ji hevaltiya bi zarokên Elewî û Durziyan re, dûrketina ji silavkirina mirovên ji van civakan, dûrketina ji karsaziyên wan, kirêkirin an firotina xaniyan ji wan re û nedayîna kar ji wan re di nava xwe de dihewîne.

Her çendî kampanyayê ji derdorên nêzî hikumeta demkî piştgirî girtibe jî yên ku ji bo jiyana hevbeş a bawerî û nasnameyên cuda li Sûriyeyê parêzvaniyê dikin, li hemberî van bangan bertekek nîşan dan. Bi daxuyaniyên ku li ser medyaya dîjîtal hatin dayîn, hat diyarkirin ku kampanyayên bi vî rengî, cudakariya mezhebî teşwîq dikin, aştiya civakî têk dibin, welat zêdetir polarîze dikin û aloziyên mezhebî gur dikin.




**Kê ev kampamya dest pê kiriye û armanca wan çi ye?**

Hesabên nenas ev kampanya bi taybetî di bin hashtagên mîna "Ez Ne Dar Im" de li ser platformên mîna X (Twitter) û Instagramê hate belavkirin. Armanca vê nîşan dide ku hinek alî bang dikin da ku têkiliya bi van pêkhateyan re bi temamî were birîn (mîna birîna daran).

Ev kampanyaya baykotkirin û tehrîdê ya li dijî Elewî û Durziyan ne ji aliyê saziyeke fermî ya diyar ve, lê belê ji aliyê hinek grûpên tundrew, çalakvanên radîkal û rûpelên nenas ve li ser torên civakî hatiye destpêkirin. Di parvekirinan de bang li xelkê tê kirin ku ji dikanên Elewiyan tiştan nekirin, baweriyê bi bijîşk û perestarên wan neynin û li nexweşxaneyên wan derman nebin.

Armanca vê kampanayê avakirina kîn û nefreta zêde di navbera civak û pêkhateyên Sûriyê de ye. Herwiha avakirina Sûriyeke nû li ser esasê yek deng, yek reng û yek pêkhat e. Di heman demê de qelskirina hebûn û nasnameya gelê Elewî û Durzî di nava Sûriyê de ango dûrxistina wan ji mafê wan ê rawa di Sûriyê de.

Ev kampanya nijadperstî, navendîbûn û yek netewê di nava Sûriyê de ava dike, ev yek jî pêşeroja Sûriyê ber bi xerabbûn û aloziyên zêde ve dibe. Sûriyê welatekî pir rengî ye, di nava xwe de gelek netew, civak û pêkhateyan digire ku her yek ji wan xwedî çand û kavneşopiyên cûda ye ku temsîla hebûna wî gelî dike. neqebûlkirina hemû pêkhateyan û ne parastina mafê wan di nava Sûriyê nû de Sûriyê ber bi şerê mezhebî û nevxweyî ve dibe ku ev yek jî hilweşîna hundirîn a Sûriyê misoger dike.

**Hikumeta demkî qala mafê gel û pêkhateyan di Sûriyê de dike, lê çima li hember vê kampanyê ranaweste û helwesta xwe nêşan nade?**

Piştî hilweşîna Rêjîma Baas û hatina hikumeteke nû a bi navê hikumete demkî a Sûriyê li ser desthiltdariyê re nijadperestî di nava Sûriyê de nehat guhertin, lê belê zêde bû. Bi hatina hikumeta demkî re komkujî li berava Sûriyê li ser gelê Elewî bi hinceta ew berhema Rêjîma Baas dest pê kir bi hezaran mirov hatin kuştin û revandin. Di heman demê de êriş li Siwêdayê li ser gelê Durzî jî hatin kirin bi sedan gelê Durzî bi hovane hatin kuştin ango ji ber ku Durzî ye hate kuştin. Lê hikumeta demkî a Sûriyê raghand ku ew kesên ev bûyerên dijmirovî li ser gelê Elewî û Durzî pêk anîne, ne girêdayî wan in û ew kes ceza kirine lê ev yek di pratîkê de pêk nehat.

Îro jî cudakar dixwazin ku komkojiyan li ser gelê Elewî û Durzî pêk bînin û hebûna wan tune bikin lê bi rengekî cûda ku gelê Elewî û Durzî di mile derûnî û pîskolojî de bikujin kampanya baykotkirinê li dijî gelê Elewî û Durzî dest pê kirin ku bi her awayî xwe jê qût bikin û dûrbixin ango weke pêkhateyek ne ji Sûriyê pê re tevbigerin. Ev kampanya ji aliyê hin kesên di Sûriyê û derveyî Sûriyê de hatiye dest pê kirin. Ev kampanya pêşî li gelek tiştan vedike ku dihêle hinek grûpên çekdar û kesên tundrew bi awayekî hêsan êriş elewiyan bikin û bi tundtijî li ser torên civakî, tirs û êrişên derûnî ava bikin.

Herwiha li bermaberî wê tê dîtin ku bêdengiyek ji aliyê hikumeta demkî ve li beramberî vê kampmayê heye û bendengiya wan diyar dike ku ew destekê didin wan kesên ev kampanya daye destpêkirin.

# Kevirên giranbuha; Kevirê spî, mermer û giranît

Ayşa Silêman/ Dêrik

**Xwediyê Kargeha Dêrikê ya birîna keviran Alî Ehmed diyar kir ku Kevirê spî, rûxam û giranît ne tenê madeyên xav in, ew wekî pira di navbera xwezayê û şaristaniya mirovî de ne.**

Kevirên spî, rûxam û giranît kevirên siruştî ne di dirêjahiya dîroka mirovahiyê de her gav wekî materyalên bingehîn ên avakirin, huner û xemlandinê hatine bikaranîn. Di nav van keviran de, kevirên spî (kils), rûxam (mermer) û giranît (granit) xwedan cihekî pir taybet in. Ev her sê cureyên keviran, hem ji hêla pêkhateya xwe ya jeolojîk hem jî ji hêla qadên karanînê ve, girîngiyeke mezin a aborî û çandî nîşan didin.

Xwediyê Kargeha Dêrik a birîna keviran Alî Ehmed di derbarî kar û astengiyên ku rastî wan tên ji Rojnameya me re axivî.

**Taybetmendiyên kevirên spî, giranît û rûxamê**

Alî Ehmed da zanîn ku her yek ji van keviran xwedî taybetmendiyên kîmyewî û fîzîkî yên cuda ne ku qada karanîna wan diyar dike û wiha got: "Kevirê Spî bi piranî ji kalsiyom karbonatê pêk tê. Ji ber ku nerm e û bi hêsanî tê birîn, di pîşesaziya çîmentoyê, boyax û çandiniyê de wekî madeyeke bingehîn tê bikaranîn. Di mîmariya kevnar de jî wekî kevirê avahiyê hatiye xebitandin. Rûxam di bin zext û germahiya zêde de, ji metamorfoza kevirên kilsî çêdibe. Ew sembola luks, estetîk û paqijiyê ye. Ji ber şewq û nermiya xwe, di peykersaziyê, rûberên hundirîn ên xaniyan û serşokan de wekî materyalekî daxwazkirî yê herî pêşîn e. Giranît; Kevirekî magmatîk e ku pir hişk û xwedî ragiriyeke bilind e. Giranît li dijî xişandin, germahî û asîdan xwe digre. Ji ber vê yekê, di rûberên metbexê, pîleyên derve, qadên giştî û cihên ku herî zêde tên bikaranîn de, materyalê herî ewle ye."

**Kar û xebatên kargeha birîna keviran**

Ehmed mîkanîzmeay karê xwe de wiha got: "Ev kevir ji me re ji Hema, Idlib û Helebê tên, ev kevir li bajarê me hene lê ji ber ku dikevin nêzî sînor û kar gelek ji wan re divê heya ku werin amadekirin lewma derfet tune ku em wan bînin. Dema kevir dighêjin me, êdî em li gor daxwaza gel dirûvê wê çêdikin. Bêtirî xwe daxwaza gel li ser kevirên mecla, ji bo avahî û xemlandinê heye. Her wiha giranît ji me re ji Çîn û Îranê jî tê, li kêlek wê ruxam jî cûreyên wê hene, ê Sûrî hene û yê Tirkî jî gel daxwaza wan dike ji bo derdora derî û pencereyan. Bêtirî xwe daxwaza gel li ser kevirê spî, zer û efenî ye, ji bo avahiya xaniyan."

**Her kar xwedî astengiyên cûda ne**

Ehmed axaftinên xwe berdewam kirin û wiha got: "Tu kar bê zehmetî nîne, lê zehmetiya em dikşînin heya ku kevir dighêjin nav destên me, gelek caran dema tên şikesî ne, ev yek bandore li karê me dike û di milê madî de jî dibe pirsgirêk. Her wiha em di milê buhayê mazotê de jî astengiyan dibînin her cara ku mazot buha bibe buhayê anîna keviran jî buha dibe û ev yek bandore li me dike. Li kêlek wê em cenetoran bikar tînin ji ber ku elekitrîn



pirî caran nîne ev yek jî dihêle ku buhayê keviran bilind bibe û kar kêm bibe. Di heman demê de dema rê di navbera me û Idlib, Hema û Helebê de tê girtin karê me jî disekine. Her wiha zehmetiya karê me jî ew e ku hemû toze û bandore li tenduristiya mirovan dike û gelek caran dema birîna keviran de kevir di nav destê me de dişkê û karmendên me birîndar dibin. "

Xwediyê Kargeha Dêrik a birîna keviran Alî Ehmed axaftinên xwe bidawî kirin û wiha got: "Daxwaza min heye ku ez kar berfirehtir bikim û alavên nûjen bînim lê ji ber ku bajar piçûke kar kême, lewma ez derfetê nabînim. Her wiha bi hêvîne ku buhayekî sabit ji bo mazotê ji me re were diyar kirin da ku bi rehetî em kar bikin."

## Oldarên Îslamê û rawişt



Hafiz Ahmet Turhalli

Ola Îslamê û mijara rawiştê jihev cuda nînin. Dema mirov behsa ola Îslamê bike û mijara exlaqê jê derxîne, ola Îslamê ji heqîqeta xwe diqete. Lê divê mirov vê heqîqetê bibine. Civaka ku îro ji xwe re dibêje ez misilman im, ji rawişt û pîvanên mirovahiyê dûr e.

Zêdetirî du milyar mirov dibêjin me ola Îslamê bijartiye û em pê bawerin!

Ger îro du milyar mirov bi bingehên ola Îslamê ku rawişte bawerî pê aniya, dê rewşa mirovahiyê gellekî cudatir ba.

Ger mirov bi bingeha baweriyê xwe ava neke, ew avakirin dê puç be û ziyan û zererê bide derdora xwe.

Avakirina kesayetan û civakên misilman ne li gor bingeha rawişt û etîkê ye. Ser şikl û rengê xwe ava dike û tê avakirin. Naveroka wê nayê vegotin û di jiyanê de wateya xwe ya rasteqînî jî nabîne.

Bêguman mirov kare bêje kesayet hene bê bawerîne û xwedan rawiştin. Heman deme mirov dibîne ku kesayet hene xwe weke oldar dibinin û ji jiyanekî birawişt durin.

Ev dîtbariyên meyên rojane dikare serê mejî tevlîhev bike.

Ger em bêjin Bawerî, şaşike, rihe, fîstane cilû berge, emê bikevin kêmasiyan. Lewre bawerî dema tiştên weke cil û berg û rihbe, ev tişt karin ji bo xerabiyan werin bikaranîn. Lê bawerî dema rawişt be û kesayet ava bike, wê deme civakekî mînak jî wê were dîtin. Qur'an a pîroz serî heta binî behsa bexşandin û merhemetê dike.

Behsa bilindiya rawiştê dike. Destgirtina mezlum û hêjaran weke erk datîne pêşberî me.

Pêxember dibêje: "Hun bawermend nabin, heta tiştên hun jixwere dixwazin, ji birayên xwerejî nexwazin".

Çi mafê we heye divê, ew mafê birayên wejî hebe. Çi hebuna we heye, divê heman hebuna birayê wejî hebe.

Îro kesayet û civakên ku jixwere dibêjin em bawermendên ola Îslamêne, bê xwe kesekî nabînin. Ji bo welatê birayê xwe dagir bikin, destê neyarên Îslamê digrin û welatê birayê xwe dagir dikin. Namus û şerafa birayê xwe binpê dikin. Mal û hebûna birayê xwe talan dikin.

Piştre jî bi vê birayê xwe re di Mizgeftê de nimêj dikin, pêre diçin Heccê, rojiyê digrin û fitarê vedikin.

Ev rawiştekî çawaye?

Bi Emerîka, Rûsya û Çînê re îttîfaqa çêdikin, ji bo Misilmanên nava xwe bikujin û hebunên wan desteser bikin.

Misilman xwedan bi dehan welatane, binavê Tirkî, Erebî û Farisî, Endonezî û Efrîkî, lê Milletê kû piştî Ereban bune Misilman kû Kurdin, ziman, çand, dîrok, ol, mezheb, siyaset û navê wan qedexeye.

Ev kîjan rawişte (Exlaq)?

Kurd li Îran, Iraq, Suriyê û Tirkiyê doza mafên xwe dikin kesên ji xwere dibêjin em Misilman in, kuştina Kurdan bi navê Îslamê helal dikin!

Gelo ev kîjan etîke?

Eşkere tê xuyakirin ku, Misilmanên îro li ser ola dewlet û desthelatên xwene. Lê nav, reng û şiklên Îslamê bikar tînin. Îslamê ji xwe re weke şûrê Îblîs, dijî Kurdan û civakên bindest bikar tînin.

Di avadankirina kesayetên misilmanên îro de bi giranî rawişt nîne! Dema rawişt ji ol were derxistin, kesayet û civakên bi nav oldar, dibin dijminê mirovahiyê.

Pêxember gotibû pîvana bingehîn ya baweriyê, tiştê tu ji xwe re dixwazî, ferze ku tu ji bo birayê xwe jî bixwazî. Lê mixabin; li gor misilmanên desthelat û yên dewletan, pirsa rawiştê negirînge, girîngtirîn tişt pere û desthelate.

Oldarên bê rawişt oldarên pere û hêza madî ne, ne bawermendên Xwedê ne.